



Danerê Rojnameya pêşî ya
Kurdi Mîqdad Mîthed Bedirxan

Armanc

Hejmar, No: 152
Îlon
September 1994
Buha - Price
20 SKR, 4 DM

Rojnameya Mehane


Ji ber daweya DEP'ê Parlamentoya Ewrûpayê têkiliyên xwe ji Meclîsa Tirkîyeyê birîn

□ Di qerara Parlamentoya Ewrûpayê de tête gotin ku; "Meclîsa Tirkîyeyê bi girtina DEP'ê û hepiskirina parlementerên wê derbeyeke mezin li demokarasiya pirpartîtiyê xistiye

□ Piştî 12'ê Îlonê ev cara duyem e ku Parlamentoya Ewrûpayê danûstendirin xwe bi Meclîsa Tirkîyeyê re qut dike

Di 29'ê Îlonê de Komîsyona Giştî ya Parlamentoya Ewrûpayê li Starsbûrgê civiya û biryar da ku, heta mahkema DEP'ê xelas bibe, dê danûstendirin Parlamentoya wan bi Parlamentoya Tirkîyeyê re bêñ birrîn.

Di biryara Parlamentoya Ewrûpayê de tête gotin ku; "Meclîsa Tirkîyeyê bi girtina DEP'ê û hepiskirina parlementerên wê derbeyeke mezin li demokrasiya pirpartîtiyê xistiye û Komîsyona Parlamentoya Ewrûpayê ku bi TBMM (Meclîsa Bilind a Milletê Tirkîyeyê) re têkili dimeşandin, dê wan têkiliyên xwe bibire. Herweha dîsa di biryare de weha tête diyarkirin: "pêwîst e daweya DEP'ê



Bîstek ji civîna Parlamentoya Ewrûpayê

bi adil bê meşandin û daxwaz ji Yekîtiya Ewrûpayê tê kirin ku heyeteke çavdîr ji bo mahkemeyê bête şandin." Parlamentoya Ewrûpayê ji Tirkîyeyê daxwaz dike ku parlementerên DEP'ê bê qeyd û şert ji hefsê bêñ azadkirin.

Ev qerar ji aliyê 7 grûbêni siyasî yên parlamentoya Ewrûpayê bi piraniya dengan (254 deng) hat stendin, 4 deng jî li hember hat dayin.

Parlamentoya Ewrûpayê berê jî, ji ber derbeya eskerî a 12'ê Îlonê danûstendirin xwe bi

meclîsa Tirkîyeyê re birribûn û vê biryarê heta sala 1988'an dom kîribû.

Herweha Parlamentoya Ewrûpayê hukûmeta Tirkîyeyê tawanbar dike, ji ber ku astenga li pêş alîkariya ku diçe Kurdistanê Iraqê, derdixe.

Meclîsa Tirkîyeyê di 2'ê Addarê de immunîteta 5 parlementerên DEP'ê û parlamente-rekî serbixwe hilanîbû û ew awêtibûn hefsa Anquerê û di der heqê wan de dawa vekirbû.

Dûmahîk: r. 11

Bi hejmar 14 saliya 12'ê Îlonê

650 hezar kes hatin girtin

1 milyon û 683 hezar kes hatin fişkirin

7 hezar kesan re cezayê idamê hat xwestin

517 hezar kesan re cezayê idamê hat dayin

49 kes hatin idamkirin

98 hezar û 404 kes ji ber "endametiya rëexistinan" hatin mahkemekirin

388 hezar kesan re pasaport nehat dayin

30 hezar kes ji ber ku "bi şik" bûn ji kar hatin avêtin

14 hezar kes ji hemwelatiyê hatin derxistin

30 hezar kes mecbûr man ku li derveyî welêt bijin

300 kes bi awakî nedîyar hatin kuştin

171 kes di işkenceyan de hatin kuştin

937 film ji ber ku "bi mehzûr" bûn hatin qedexekirin

14 kes di protestoyen li hember kîrinên dewletê, di hefsan de di grewa birçibûnê de mirin

23 hezar û 667 komele hatin girtin

3 hezar û 854 hezar mamoste, 120 mamosten unîversiteyan û 47 hakim ji kar hatin avêtin

7 hezar û 233 memûren dewletê hatin surgunkirin

9 hezar û 400 kes bi xala 1402 ji kar hatin avêtin

3 hezar û 315 sal û 6 meh yekûna cezayen ku dan rojnamevanan

303 dawe di derheqê 13 rojnameyên mezin de vebûn.

4 hezar sal ceza ji bo rojnamevanan tê xwestin.

14 rojnamevan hatin kuştin

Bi qezaya keştiya "Estonia" yê re Li Swêdê xemgîniyeke mezin

□ Ji 1049 rîwî û karkerên di keştiya "Estonia" yê de bes 138 kes filitîn. Piraniya rîwiyan Swêdî bûn. Piştî Swêdiya, hejmara pir a keşen di keştiyê de Estonî bûn.

Swêd û Estonia roja 28'ê Îlonê bi nûçeyeke reş hejiya; keştiya Estonia ku di navbera Talîn û Stockholmê sefer dikir li nîvê Derya Baltik bin av bû. Li gor agahdariyên resmî 861 rîwî (hejmara zarakan ne tevi vê hejmara ye) bi keştiya Estonia yê rîwîti dikirin. Ji bûyerê bes 138 kes sax filitîn.

Roja 28'ê Îlonê seet 00:24'an de keştiya Estonia cara dawîn hewarê xwest û da diyarkirin ku wê bin av bibe. Keşti ji lîmana Talîn 27'ê Sibatê seet 18:00'an de ber bi Stockholmê bi rî ket. Rîwîtiya wê 16 seet bû, diviya bû roja 28'ê Sibatê seet 10:00'an de li Stockholmê bûna. Keşti li nîvê riya Talîn û Stockholmê, di nîvê derya Baltîk'ê de, seet 00:45'an de bin av bû.

Ji ber navê zarakan di listeyê de tuneye hejmara rîwiyan tam ne diyar e. Bêyî zarakan li gor listeyê 861 rîwî û 188 personal di keştiyê de hebûn. Ji van bes 138 kes filitîn. Piraniya rîwiyan Swêdî bûn. Piştî Swêdiya, hejmara pir a kesen di keştiyê de Estonî bûn.

Li gor agahdariyên heta nuha ci-


viyane, sedema qezayê, yet ji deriyan pêşî bas ne girtibûye. Bagur û pêlîn avê zor dane wî deriyî, hin bi hin qata ku kamyon û otomobil tê da ne av lê zêde bûye. Ew av, li ser deryaya ku pêlîn wê digihîstîn 8-10 metreyî balansa keştiyê xera dike. Piştî balansa keştiyê xera dibe, kamyon û erebêne mezin di qelibin, keşti li ser aliyekî xwar dibe û hîn bêtir av digre. Ji 4 motoren keştiyên dudu disekinin û di nav 15 deqîqeyan de keşti bi temamî bin av dibe.

Piştî keşti yek kîlek dibe û erebêne mezin di qelibin, rîwiyan di keştiyê de, yên li odayêne xwe, yên li restaurandê, yên li barê hemû êrişen deriyan dikin, dixwazin deren qata hafê. Di wê panîkê de gelek kes dest û piyên xwe dişkînin. Yen dertêna qata jor jî xwe davêjin avê. Ji ber hewa bagur, derya bi pêl, ava cemidî û şeva tarî, nikarin li ber xwe bidin. Ew kelekên bi keştiyê ve girêdayî jî digel hewldana jî venebûne.

Keştiya pêşî ku dighije ciyê hawarê, piştî bûyerê 45 deqîqe sun da ye. Piştî wê di nav 15 deqîqan de 3 keştiyên din jî dighijin ciyê bûyerê. Ev hemû keşti jî yên rîwiyan in. Dû re helikopter dighijin hawarê. Kesê herf dawî hatiye xelaskirin 14 seet û nîv piştî bûyerê kaptanê duyem yê Estonia bûye.

Rîwiyan keştiyê piranî grûbêne hevalê kar yan yên mektebê bûne.

Dûmahîk: r. 11



Keştiya pêşî ku dighije ciyê hawarê, piştî bûyerê 45 deqîqe sun da ye. Piştî wê di nav 15 deqîqan de 3 keştiyên din jî dighijin ciyê bûyerê

Illustration: Helen Rasmussen

Rojeva Mehî

Mûrad Ciwan

Emperyalîzm û demokrasî teb'atî û hemwelatîti

Li Tirkîyê tu carê demokrasî bi cîh nebû ku meriv karibe bibêje, filan dewr dewra demokrasiye ye. Helbet di tarixa jiyana xwe ya heta îroyîn de dewleta Tirk gellek reng û uslûbêne idarekirinê wergirtin. Gawa dewr dewra İmparatoriya Osmanî bû, idara padişahiye mutleqî ya merkezî hebû, piştre di demen dawî yên İmparatoriye de têkoşinêkî di navbera mutlaqiyet û meşrûtiyetê heye rû da, heta carekê-du caran tecrûbê "meşrûtiyet"ê ji bo demen kurt ên muweqet bi ser jî ketin. Piştre cumhuriyet wek mîrasxurê İmparatoriye hat, di destpêkê de idareye ka yek-partitî ya yek şefî hat, piştre, dinya guherî ilana Tirkîyê jî cihê xwe da "idareye ka pir-partitî" ew jî nebû; inkilabêne leşkerî û "idareye ka pir-partitî" li pey hev hatin û çûn.

Lê hemû van reng û uslûbêne idarî, naverok û karekteras esasîn a dewleta Tirkîyê neguhartî; Tirk yê wekî dewlet, tu carû nebû demokrat her û her ma emperyalist.

Belê ji roja pêşin û hata iro xusûsiyeta heri berbiçav a dewleta Tirk ew e ku dewletek emperyalist e. Emperyalistiya wê ne tenê bi wê mahna ku di serê me da cih gitteye ku em dibêjin welatên din bindest kirine, dest daniye ser mafê xwe idarekirina miletetan. Helbet ev xusûsiyet her û her bi dewletê re hebûya; di dema Osmanî de jî dewra Cumhuriyeta Tirkîyê de jî bi vê mahnê dewlet emperyalist bûye. Lê ya ku ez dixwazim li vê derê behs bikim ne ev e. Emperyalistiya dewleta Tirk ji vê jî pêşdetir, bizzat di avabûna wê bi xwe de heye.

Emperyalistî, fermandarî, emirdarî ye. Dewleta emperyalist bi vê mahnê dewletek welê ye ku di ser serê hemû civakê re ye, hukum, ferman, idarekirin hemî di destekî merkezî de civiyaye, yê ku di çarçeva hukumraniya vê dewletê de dijîn teb'a ne yanî tabi'ê wê dewletê ne. Ne ku dewlet ji bi civakê ye, lê civak bixwe ji bo dewletê ye. Têkiliyên navbera milet bixwe û yê navbera milet û dewletê ne ku têkiliyên hemwelatî (watandaşî-citizenship) lê yê teb'ayiyê ne. Di hemwelatiye de, mahneyeka "şirîkatî" heye. Mirov, bi novê din ên welatî re "şirîkatî" wî welatî ye. "şirîkatî" heqekî, parekî di wî welatî de dide meriv, serbestiyekî, azadiyekî dide meriv. Lê teb'atî ne welê ye. Meriv tabi'ê tiştekî ye, li pey wî dice, tu mafekî mirov li ser wî nîne, ew bibêje "bimre" meriv dimre ew bibêje "bimîne" meriv dimîne. Loma jî behsa maf, azadî serbestiyê di vê sistemê de nîne.

Gava meriv bala xwe dide tarixa dewleta Tirkîyê ev xusûsiyeta wê eşkere dibe: Tu carê nebûye dewleta hemwelatiyan, lê her û her bûye dewleta tabi'an.

Xusûsiyeteke din jî ew e ku di kultura civakê de, dewleta tabî'îyekî bi awakî gellek şerî û tebii û meqbûl hatiye dîtin. Gellek normal hatiye dîtin ku neku dewlet di xizmeta miletê de be lê milet di xizmeta dewletê de be. Loma jî yê ku di dewletê de idare xistine destê xwe, memûrtî kirene, ji sultan û reisecumhûr bigre heta bekciyekî mehelê an cendirmeyekî, hemiyan ne ku xwe di xizmeta milet de dîtine lê xwe serdestê, idarekirinê û fermanrewayê milet dîtine. Milet bi xwe jî ev yek weha dîtiye, wiha qebul kiriye û gotiye "divê ku weha be".

Têkiliyên navbera dewlet û civakê, di dema sultanan de jî di dema cumhuriyetê de jî, ci tek-partitî ci jî idarêne leşkerî bin her bi vî awayî meşîyane. Yanî dewleta Tirk her dewleteka emperyalist maye.

Bivê mahnê, bi baweriya min demokrasî û emperyalistî ziddê hev in. Li cihê ku demokrasî hebe emperyalizm nîne û li ciyê ku emperyalizm hebe demokrasî nîne.

Nexwe emperyalizm tekabulî avayıyek teb'atî û demokrasî jî tekabulî avayıyek hemwelatî dike. Heke mirovî divê bîgihiye demokrasiye divê berî her tişti mirov xwe ji teb'atîyê xelaske, bike hemwelatî.

Li Tirkîyê hemwelatî hîn wekî fikrekê di mejiyê insanan de bi cih nebûya, gelo wê çawa wek realiteyekî di jiyana wan de bi cih bibe?

Em xwe nexapînin hê jî Tirkîyê re pirr divê!

"Bi ilmê min bike, lê bi emelê min neke"

Serbest Bender


Di 3'ye Îlonê de Komîteya Hêzên Siyâsî yên Kurd û Kurdistanî (Hevkari) û Federasyona Komeleyen Kurdistanê li Swêdê, bi hev re li Stockholmê semînerek amade kiran. Mijara semînerê rewşa dawîn ya Kurdistanê bû û ji aliye Sekreteye Giştî yê Partiya Sosyalist a Kurdistanê Kemal Burkay hate pêşkêşkirin. Guhdaran bi hêviya ku wê agahdariyênuh bistînî bi dilekî heyecan li birêz Burkayî guhdarî dikirin, lê mixabin ew hêviya ku besdaran ji semînerê dikirin tûnebû. Ji bo guhdaran tişte heri nuh ew bû ku, PSK'ya ku şerî çekdarî naparêze ji xelkê Kurd paraştina vî şerî dikir.

Ew şerî çekdarî naxin nav prensibîn xwe lê xelkê daweti xwendîlerketina vî şerî dikin. Birêz Kemal di axaftina xwe de wiha digot: "Edî tîr ji kevana xwe derketiye, her çiqas metodêwan şasbin ji divê Kurd nehelin ev sera rawest e". "Di warê ekonomî de dewleta Tirkîyê ketiye krizek dijwar." Bi raya min dewleta Tirk, nikare vî şerî dûr û dirêj bi rîva bibe. Ew cehda dawiyê ye, ew hemla dawiyê ye, salek bikşîne du sal bikşîne lê yê dawiyê ye." "Eger ser rawest e ewê tevgera Kurd zû bi zû bi serxe neye".

Gelo birêz Kemal dizane ku devleta Tirk ji dixwaze şer berdewam be?!

Yan na eger baweriya birêz Kemal Burkay ev be, çima PSK bîr yara şerî çekdarî nagre? Yan na, him hûn xwe ji şer vekişinîn û him jî xelkê daweti paraştina şer bikin, bi min ne samimiyezi ye. Eger birêz Burkay ji vê yekê bawer

Seminera Kemal Burkay



Di 3/9/1994'an de li Stockholm'da ji alî Sekreterê Giştî yê Partiya Sosyalist a Kurdistanê Kemal Burkay semînerek hat pêşkêşkirin. Mijara semînerê rewşa dawîn ya Kurdistanê bû. Nêzî 300 kes besdarî vê semînerê bûn. Amadekarên semînerê Komîteya Hêzên Siyâsî yên Kurd û Kurdistanî (Hevkari) û Federasyona Komeleyen Kurdistanê li Swêdê bû.

dike, divê beriya her tişti guhertîn-ekê di programa partiya xwe de bike, yan na eger manewrayek siyâsî be, bi min ev jî hesabêni piçuk in.

Ji guhdaran pirsek li ser yekitiya sosyalistan ji Kemal Burkay hate kiran. Pirs ev bû: "Bangek ji bo yekitiya sosyalistan hatiye kiran heta nuha YEKBÜN, KUK-RNK û TSK ji bo vê yekitiye hin gav avetîne. Gelo baweriya we û ya partiya we li ser yekitiya sosyalistan çi ye?". Di bersiva xwe de wiha got: "Em wek sê sal berê li meselê nanêrin." "Me xwest em bi hinekan re yekitiye çêkin lê bi sermeket, lê em diktatoriya proletarye naynîn, em nikarin bi yên xwedî bê istiqrâr re wextê xwe hunda bi-kin."

Belê, tişte heri baş ew e ku mirov bikarî li gor şerî û şirûtê gel û welatê xwe, di wext û cihen xwe de tesbitan bike. Lê ne bi mantiqê em ji her kesî "sosyalistir", "demokrattir" û "şerkartir" in. Ev yeka ne pêşveçûnê û ne jî istiqrâr bi xwe re tîne.

Beriya sê salan jî di semînerek li ser pîrsa Kurdistana Iraqê ku di wexta Şerî Xelîcê de birêz Kemal di axaftina xwe de wiha digot: "Ev şer ne şerî Kurdistana e. Divê Kurd di vî şerî de bê teref bin. Kurd ji vî şerî ci istifade nakin. Eger Kurd mudaxeleyî vî şerî bikin wê zera-

rekî mezîn bibînî. hwd". Lê bûyeran aşkere kir ku Birêz Burkay di dîtinê xwe de şas derket. Gelo dîtinê ku hingê hatin zîmîn li gor kojuktura dînyê li gor prensîba dijî-emperyalizmê hatin zîmîn yan jî bi rastî wiha dihat bawerkirin?! İcar "istiqrâriya siyâsî" ev e? Lê gava ku mirov li axaftinê Kemal Burkay dinêre, ew partî û rîxistinê din bi ne zelalbûn û bê istiqrâriye ûtham dike.

İcar ez dipirsim di mesela sosyalizm û diktatoriya proletaryayê de yê ku heri dereng dîtinê xwe guhertîn kî bûn?

Yân ku li dijî şerî çekdarî derdiketin û iro dixwazin bidin parastîn (bê ku di progarama wan de hebe) kî ne?

Birêz Kemal Burkay ji Kurdistana dixwaze ku Kurd piştgiriya şerî çekdarî yê ku bi serokatiya PKK'ye, bikin.

Lê zelal nekir ka rengê vê piştgiriye çiye û PSK bixwe wê di praktikê de çawa piştgiriya şer bike; Erê li gor birêz Kemal Burkay divê; Kurd têkevin nav ERNK; Kurd cebheyeke nû a şer vekin; Kurd belavokên şer ên ERNK belav bikin; yan ci bikin?

Bersîva van pîrsan zelal nebû û lewra jî politikaya bi istîkrar yan ya bê istîkrar kîjan e, ew jî diyar nebû.

Li Sûriyeyê Mafê Mirovan?!

Li Sûriyeyê hîn jî heq û huquqên mafê mirovan yên bingehîn tunene. Kurd li welatê xwe "ecnebî" ne û ji bo "ecnebî" ne jî ji gelek mafan bê par in. Mafê wan yên dengdanê, yên xwendîna unîversîteyan, yên mal û milk li ser xwe tapûkirinê, yên karkirina di daîreyen dewletê de, yên feydekirina ji imkanen dewletê û stendina pasaportê tuneye. Heta kesek "ecnebî" nikare di otelekê de şevekê jî bê destûr razê.

İcar wexta meriv li vî welatî bê nîfûs û navê merivan jî bi Kurdi be muskuleyên mezîn têne serê mirovan û ji imkanen dewletê yên sinorkirji me riv nikara feydê bigre.

Helepce yek ji wan e. Pişti qetliama Helepçeyê, da ku ev qetliama neyê ji bîrkirin bavê wê, navê wê Helepçeyê da niye. Helepce ji malbetke bînifûs e yanî "ecnebî" ye. Ecnebî jî di nav xwe de çend kategori ne. Li gor kattegoriyaku malbata Helepçeyê tê de ye, mafê Helepçeyê heye ku 11 salan biçe dibistanê. Lê navê wê dibe sebeb ku sergêjiye jê re derxin. Midûra dibistanê ji ber navê wê, wê li dibistanê qeyd nake û ji bo ku qeyda wê çêke, Helepçeyê pîwîst e ji Emnî Dewlê kaxizeke bîne. Bavê Helepçeyê Elî destê wê digre û dice ber Emnî Dewlê. Emnî Dewlê ji bo kaxiz jê re binivise, dibêje lazim e navê keçikê bê guherandin. Ew vê navê qebûl nake. Lê bavê Helepçeyê bi gotina zabîtî eskerî nake û dibêje; "We Ereban ev qetliama nekîribâ, min jî navê wê Helepçeyê dane-nya". Lê Elî bi xwe bawer e û zane li Sûriyeyê bi bertîl her tiş dimeşe. Radibe hinek pereyan dike bîrka zabit û kaxizeke ji zabit distîne. Zabit Elî dişine ber muxtar, muxtîr kaxizî wê erê, dike. Yanî hestyeke Elî û keça xwe geh li wir, geh li vir, dawiyê de bi pereyan be jî qeyda Helepçeyê cedîke.

Helepçeyê û wek Helepçeyê li nav Kurdistana Sûriyeyê bi sedan in. Ev kesen ku navê wan weha bin û "ecnebî" bin problemen wan jî giran in.

Nav :Helepçeyê
Paşnav: "Ecnebî"

Armanç

Rojnama Kurdi ya mehane/Monthly Kurdish Magazine
Redaksiyon: M. Elî, Hesen Mizgin, Mîrza Bextiyar, Lewendî Fîrat, S. Rêving, M. Lewendî, Redaktör berpirsiyar: M. Elî, Berpirsiyarê beşî Dimîkî: Malmîsanîj,

Berpirsiyarê rüpelîn edebî: Ehmed Huseynî

Utgas av: Kurdiska Demokratiska Arbetarunionen

Aboneti/Prenumeration: Abonetiya Salekê, Li Skandinaviya: 250 SKR, Maqam/Myndigheter: 450

SKR, Li Ewrûpa: 60 DM. Li derveyî Ewrûpa: 50 \$,

Anons/ilan: nîv rişpel/en halvisandan 2500 SKR

Telefon: 46-8-803135 Fax: 46-8-801825 Postgiro: 50 37 99-9

Adres: Box: 152 16
161 15 Bromma/Sweden

ISSN: 0348 7385

Hilbijartinên Swêdê:

Partiyên çep bi ser ketin

□ Keça Kurd Nalîn Baksî di listeya partiya Sosyal Demokratan de bû parlamente.

□ Partiya Çep (Vensterpartiet) ji sala 1948'an vir ve cara pêşin ê dengê xwe ewqas bilind kir û % 6,1 22 parlamente xistin Meclisê

Di hilbijartina 18'ê Îlonê de Partiya Sosyal Demokrat, Partiya Çep (Vensterpartiet) û Partiya Hawîrdorê (Miljöpartiet) heri bi qezenc derketin. Bloka Partiyen rast ku di 3 salên dawiyê di iktidarê de bûn dengê wan kêm bûn û Partiya Ny Demokrati (Demokrasiya Nû) ku partiyek nijadperest bû, bi temamî wendakir û % 4,0 derbas nekir.

Partiya Sosyal Demokratan 7,7 dengê xwe zêdekirin û bi % 45,4, 161 parlamente derxist, yek ji wan parlementeran keça Kurd Nalîn Baksî ye. Ew di belediya Stockholmde di rîza 9'an de bû parlamente. Li gor agahdariyan Kurdêni li Stockholmde dijîn û mafê wan ê dengdanê hebûn, piraniya wan dengê xwe ji bo Nalîn Baksî dan Partiya Sosyal Demokratan.

Partiya Çep (Vensterpartiet) ji sala 1948'an vir ve cara pêşin dengê xwe ewqas bilind kir û ji % 6,1 û 22 parlamente xistin Meclisê. Partiya Hewîrdorê

(Miljö Partiet) ji piştî 4 salan carere din 18 parlementer xist meclisê û % 5 deng girt. Partiyen ku van 3 salên dawiyê bi koalisyonê Sweđe idare dikirin, xeynî Partiya Moderat (Konservativ) partiyen din; Folkpartiet (Partiya Gel), Centerpartiet (Partiya Merkez) û KDS (Partiya Xristian Demokrat) dengê wan kem û hejmara parlamente û wan hindik bûn Partiya Moderat % 22,4 û 80 parlamente derxist û dengê xwe % 0,4 pirtir kir. Folkpartiet % 7,1 û 27 parlamente, Center % 7,7 û 28 parlamente, KDS % 4,1 15 parlamente derxistin. Partiya nijadperest a li diji biyaniyan Nydemokrati % 1,2 deng stend û 25 parlamente û yêne ku berê hebûn hemûyan wenda kir.

Serefhan Cizîri ku namzete Parlementoyê bû û ji Partiya Çep bû, qezenc nekir. Jina Kurd Necla Bora li Stockholmde û peyakî Kurd Şoreş Bladhede ji li bajarê Uppsalayê di listeya Partiya Çep de, bûn encumanen Belediyê.

Li gor neticeyên hilbijartine Partiya Sosyal Demokratan dê dîsa



Keça Kurd Nalîn Baksî bû parlamente
Partiya Sosyal Demokrat

hukûmetekê mînoretet(hindikayî) ava bike.

Her weha li Danîmarkayê ji Partiyen Çep di hilbijartina 21'ê Îlonê de bi ser ketin. Partiyen wek Redikele Venstre (Partiya Çep ya Redikal) û Venstre (Çep) dengê xwe zêde kirin. Sosyal Demokrat Her çiqas 3 prosent dengê xwe kêm kirin ji dîsa wek Partiya heri mezin ya Danîmarkayê ma.

Sebebênu Partiyen çep him li Swêdê û him ji li Danîmarkayê di hilbijartinan de bi ser ketin bêkarî û krîza aboriyê ya van welatan in.

Pirsa Kurdi li Nordisk Forumê

Sermin Bozarslan

Nordisk Forum (Forumu Bakur) cara duwemîn civîya. Vê carê ji welaten cûrbecûr li dora panzdeh hezar kes besdarî Nordiskt Forumê bûn. Nordisk Forum, ji bo pîrsigirêkîn jinan di her beşa civatê de û ji bo wekheviya mafen jin û mîran, wek platforma munaqşe, dîtin û pêşniyaran fonksiyonê dilize. Di eyî demê de ji konferanseke resmî, bi besdarîya wezîren wekheviyê, li Îskandînavya dicivin û li ser istatistik, lêkolînê nû û perspektifê nû guftugo dikin, diğihîn neticeyekê.

Nordiskt Forum cara ewil li Norveçê civîyabû. Wê demê Komela Demokrat a Jinêndî Kurdi li Swêdê besdarîya wê forumê bûbû. Lî vê carê Nordiskt Forum di navbera 1-6 / 8 / 1994'an de li Finlandiya, li bajarê Åbo civîya. Li ser navê Yekîtiya Jinêndî Kurdistanê li Swêdê; Sermin Bozarslan, Meral Gundogân, Ayşe Bal û Serpîl Înanç di Nordiskt Forumê de besdar bûn. Lennart Asp ji wek alîkar ji bo wergera zimîn, wêne û karêne tekniyîn di forumê de li gel delegasyonê besdar bû.

Li salona Kuppîs ya sporê raxistînek ji pirtûk, afîş, belavok, kovar û xebatîn jinan ku bi destan hatibûn çêkirin hat amadekirin. Ev raxistîn hefteyekê vekirî ma û ji welatin cûrbecûr gelek kes hatin ev

raxistin ziyaret kirin û ûnformasyon wergirtin.

Di 2 û 8 tebaxê de li Uniwersîta Åboyê semînerek hat amade kirin. Semîner roja yekem bi îngilîzi, ji aliye Serpîl Înanç û roja duwem ji bi Swêdî ji aliye Sermin Bozarslan ve hat dayin. Di semînera ku ji aliye Sermin Bozarslan ve hatibû amade kirin; li ser rewşa Kurdistanê û jinêndî Kurdistanê bi a spekten kolonyalîzm, patriarkalîzm û islamî ve agahdarî û ditin hatin pêşkêşkirin. Di navbera semîneran de film hat nîşandan û helbest hatin xwendin. Jinek bi navê Margeretha ji qala gera xwe ya li Kurdistanê kir û wêneyen xwe nîşanî besdarvanan kir.

Roja 4'ê tebaxê de ji programa kulturî li xaniyê kulturî yê Åboyê, li salona pirtûkan hat amadekirin. Di vê programê de ji Serpîl Înançê çend helbest û kîlîmîn Kurdi yê jinêndî Kurdi, bi îngilîzi û swêdî, bi alîkariya skêcan pêşkêşî guhdaran kirin. Vê programa kulturî gelek bala guhdaran kişand. Radyoya Finlandî, program qeyd kirin û di dawîya programê de ji bi Serpîl re hevpeyîn çêkirin.

Ji bili van tiştîn jorîn, delegasyonê hefteyekê di cihîn cûrbecûr yêne forumê de ji bo bala besdarvanan foruma jinan ya Îskandînavyayê bikşînîn ser pîrsa Kurdi, xebatîn propagandayê kirin. Ji bo Leyla Zana û parlament

teren Kurd yê din bê qeyd û şert bêne berdan û parlamente û wan şunde bê dayin, îmze hatin beravkirin û her weha ji bo ku Konseya Ewlekîrî û Hevkariya Awrupayê heyetekî bişîne Kurdistanê ji îmze hatin berhevkin. Qasî du hezar kesan ji welaten cûrbecûr yên besdarvanan Nordiskt Forumê ûmzayen xwe di bin van daxwazan de avêtin. Bi hezaran belavok ku doza boykotkirina turfîma Turkiyê dikir, hat belavkirin û li ser van babetên jorîn li ber unîversîtya Åbo civîn hat amadekirin. Îmzayen ku ji bo parlamente û Kurd hatin berhevkin ji Serokkomarî Turkiyê Suleyman Demirel re, ji serokê meclisa Turkiyê re, ji Weqfa Mafen Mirovaşî li Enquerê re û ji Amnesty International re hatin şandin. Belavkirina belavokan ji bo boykotkirina turfîma Turkiyê re û kampanya îmze beravkirin ji bo babetên jorîn li ser navê Federasyona Komelîn Kurdistanê û Yekîtiya Jinêndî Kurdistanê Li Swêdê hat kirin.

Çapemeniya Finlandi ji xebatîn jinêndî kurdi re gelek eleqe nîşan dan, fotograf kişandin û li ser semîneran û xebatîn din material wer-girtin. Herweha televizyonâna Swêdê ji bi du kesen delegasyonê re li ser raxistinê hevpeyîn çêkirin.

NEYNIK

Xebata legal û Kurd

Nîhad Elî

Em Kurd ji ber rînedana dewletên kolonyalist, bi piranî mecbûrî xebata îllegal bûne. Kar û xebatîn ku di warê legal de hatine kirin, piştî demekê ji aliye dewletên kolonyalist ve hatine berbendkirin. Her çiqas di vî warî de ablûqeyek heye, lê cardin ji li gor rewşê û demê em Kurd dikarin ji hin imkanan sûdê werbigrin.

Li Kurdistana Bakur, kurdan di salen dawî de di vî warî de gelek gav avêtin, lê belê piraniya wan gavan, ji ber sedema rast bikarneanîna vê riyyê bi ser neketin. Bi taybetî di warê partiyen legal de kurdan nikarîbûn ji rewşa siyâsî ya Turkiyê baş sûdê werbigrin. Nexusme alîgirîn PKK'ê di vî warî de gelek şâsi kirin. Helwêstên wan ên şâş rê de ku HEP (Partiya Ked a Gel) û DEP (Partiya Demokrasiyê) bê berbendkirin. Helbet sedem ne tenê ev şâsi bûn. Dewletê dixwest riya legal li ber kurdan bigre, ji ber vê ji li hêcetan digeriya. Ev şâsi bi hêsanî jê re bûn hêcet. Dewleta Tirk ji bo ku riya xebata legal li ber kurdan bigre ci ji destê wê dihat kir û hîn ji dike. HEP û DEP girtin, berpirsiyaren wan avêtin hefsê, hin ji wan kuştin, ew wek dijmin ilan kirin. İro hatiye wê radeyê ku HADEP (Partiya Gel a Demokrasiyê) li piraniya bajarên Kurdistanê nikare şaxen xwe veke.

Ji xwe piştî girtina DEP'ê kurdên ku di nav de cî girtibûn bûn se bes. Ji wan hinan bi lez HADEP ava kirin, hinan YDDH (Tevgera Guherîna Demokratik a Nû) ilan kirin û hîna ji li ba Şerfettîn Elçi cîh girtin. Helbet ji vê perçebûne re hin sedem hebûn û sedem ji helwêstên alîgirîn PKK'ê bûn.

Bifikirin! Dema ku hemû bi hev re bûn nikaribûn hin gavan bavêjin, vêca her grûb ewê bi serê xwe çawa gavan bavêje. Di vê rewşa iro de ewê ji wek hin partiyen çep ên tirkan (SBP, İP, SİP, BSP û hwd.) bibin partiyen marjinal..

Piraniya van aliyan partyeke Turkiyê diparêzin, dibêjin em dê partiya tirk û kurdan bin. Lîbelê bêyî çend kesen ku tesîra wan di nava civakî de nîne, kesê tirk bi wan re kar nake.

Li gor baweriya min li Turkiyê hêzên çep nikarin tu guhertinê bikin. Çimkî tesîra wan li ser civakî tuneye. Li Turkiyê di maneya berê de şoreşâ çîna karker çenabe. Dev ji şoreşê berde, hêzên çep bûne grûbîn marjinal, di hilbijartinan de nikarin %1 dengan bigrin. Li Turkiyê ancax beşek ji birjûwazî û rewşenbiran dikarin pêşengiya hin guhertinan bikin.

Ma gelo de rewşeye weha de ne baştir e aliyeen ku partyeke Turkiyê diparêzin bi aliyeen ku tesîra wan di nava civaka Tirk de heye re li hev bikin û bi hev re partiekê ava bikin ku di programa wê de hin guhertinê civakî û bidestxistina hin mafen gelê Kurd hebin? Wek mînak YDH (Tevgera Demokrasiya Nû) ku pêşengiya wê serokê berê yê TUSIAD'ê (Komela Kardar û Pîşesazên Tirk), Cem Boyner dike, Şerfettîn Elçi û hevalen wî, Melik Fîrat û hevalen wî, heta Aydin Menderes û partiya wî (Partiya Demokrat) bi hev re kar bikin. Wek têtezanîn di nava YDH de gelek kesen çep û rewşenbir ji cîh digrin. Cem Boyner û tevgera wî di vî warî de mînakek e. Ew pergaleke nû, demokrasiyeye nû û nîrîneke nû diparêzin. Helbet ev "nû" ne di maneya ji kokê de guhertin e. Ew vê "nû" yê di wateya reformê de bikar tûnîn. Aşkera ye ku ev daxwazî de demeke pirr kurt de pêk nayen. Lîbelê ku ev raman bibe hêz dikare dest pê bike. Heke di nava civaka Tirk de hin alî dixwazin hin reforman çêbikin, ma ne divê meriv piştgiriya wan bike. Helbet tenê ev reform armanca me pêk naynin. Lîbelê rîyan li ber me vedikin. Ji xwe ji kokê de guhertina sistema Turkiyê ne barê me ye.

Divê kurd hewl bidin ku di hilbijartinê giştî yê pêş de besdar bin. Li gor baweriya min kurd bi serê xwe nikarin vê yekê pêk bînin. Ya em ê partiek kurdan a xurt a legal ava bikin û bi hinan re hevkarîyê bikin, an ji em ê bi hinan re partiek Turkiyê ava bikin. Ya heri bas ew e ku kurd partiek xwe ava bikin (ev partî dê partiya hilbijartinan be) û bi aliyeen ku tesîra wan di nav civakî de heye re tifaqê bikin. Partiyen ku iro di meclisê de cî digrin nabin hevkarîn me. . Helwêsta wan a li hember pîrsa kurdî li ber çavan e. Eger YDH hîn pêşkeve û bibe partiek dikare bibe hevkarâ me. Li gor baweriya min divê kurd bi wê re tifaqê pêk bînin.

Di vê mijarê de divê HADEP û Tevgera Guherîna Demokratik a Nû (YDDH) ku hevalbendîn Dêngê Azadî ne, li xwe varqîlin û ji bo partiek xurt û fireh gavan bavêjin. Pêwîst e hemû kes û hêz bi hêsanî bikaribin di nav partyeke weha de ciyê xwe bigrin. Ev partî divê serbixwe be, ne ku bi direkîf û telefonan bête idarekirin.

Dema ez weha dibêjim nayê wê maneyê ku ez li dijî avakirina partyeke Kurdi ya legal im. Na, ez ne li dij partiek weha me. Ji bo ku di warê resmîyetê de kurd werin qebûlkirin, divê ku em partyeke kurdî avabikin. Her çendî di rewşa iro de partyeke kurdî nikare bibe partyeke hilbijartinan û ji xwe dewlet jî iro rê nade ku partiek weha ava bibe, ava bibe ji nikare li Kurdistanê şaxen xwe veke. Li gel vê yekê jî divê em dev ji vê hewldanê bernedin. Ya heri pêwîst li ser hev bûyînâ tevgera netewî ya gelê Kurd e. Eger em ne li ser hev bin em ê nikaribin di qada siyasetê de roleke berbiçav bilizin.

Divê em kurd ne tenê li gor civaka Kurd her weha li gor herêmê û dînyayê siyasetê bikin, û li gor şertan bikaribin gavan bavêjin. Li Kurdistana Bakur iro tevgera gelê me hatiye qonaxekê ku divê hin ga-vênen nû bêne avêtin, yan na dîrok wê careke din "tekertur" bike. Gelo kurd dê bikaribin hin tabûyan hilweşin, xwe ji bin tesîra "terora ramانî" xilas bikin û li gor dînyayê siyasetê bikin? Vê yekê em ê hemû bi hev re bijîn û bibînin.

RAMANÊN RAMANWERAN

Şerê navxwe şerê hilwesandina destxistinan e

S. Bengîn

Serê ku li başûrê welet di nav herdû hêzen ji hêla potansiyel mezintirin de derket, li gor termînolojîya şer, şerekî navxwe ye. Di şerên navxwe de, ya hêzek bi ser dikeve, dewletê û desthilata welet bi zora çekan digire, ya ji her hêzek beşeki welet ji xwe re digire û idara xwe ava dike. Lê herdû encam ji ne huqûqî ne.

Şerên navxwe li hemû deran, di maneye huqûqî û sîyasî de, ji bo bi zorê girtin û bi hinekî din re parvenekirina desthilata welet e. Di desthilateke bi vî awayî bidestxistî de demokrasî tuneye; desthilateke wî temsîlkariya irada gel nake û ne qanûnî ye.

Di taybetiya başûrê Kurdistanê de, hêzek ne kare a din rakes û ne ji kare bi serê xwe tenê welet idare bike. Bi şerekî wî hew welat û gelê reben li ber nigan dire, welat dibe du beş û du herêmén leşkerî. Ev yek gunehkariyek mezin e.

Ez çûm wir, min dît û bîhist. Dewlet hilwesandine, herdû hêzan idara herêma xwe girtine destê xwe. Karmendên ku heval û dilwazên YNK bûn ji herêma Behdinan çûne û ên ku heval û dilwazên PDK bûn ji ji herêma Soran çûne. Ne bi dilê xwe çûne, ji bo ku canê xwe xelas bikin çûne. Li herêma Behdinan Partî her tişt e. Li herêma soran ji YNK her tişt e. Leşkerê dewletê belav kire. Ne dewlet û ne ji Parlemento heye. Heger herdû serok nexwazin, parlemento nikare tu karan rîve bibe. Di rîvebirina kar de, ji komeleke kulturi a bajarê Hewlîrê bêtir ne xwedî îxtiyarî ye.

Şerê navxwe, ji hêla netewî de wendakirina yekgirtina netewî ye û ji hêla leşkerî de ji, wendakirina bi hezaran, belki ji bi dehhezaran kesen ku amade ne welatê xwe li hember êrisen ji derve bîn welet, biparêzin e. Ev kirin, mixabin ne karekî neteweperiye, bi maneyeke din, karekî wî hew kuştina welatperweran e, talankirina welet e û bi kîmasî binêvîkirina potansî-yela welet a parêzgerîye ye. Ji ber ku dijminen Kurdan xurt in û Kurd bixwe qels in, qeweta wan nagîhe wendakirinê wî mezin. Şerekî wî bo Kurdan destpêka wendakirina hemû destkewtiyan e. Li gor ku tê xuya kirin, ev şerê xwe bi xwe, bû sedema ku Tirkîye, İranê,

Sûriyê û bi awayekî veşartî ji Iraqê, karibin di diplomasîya navneteweyî a di derheqa pêwîstiya yekgirtibûna axa Iraqê de piştgiran li xwe pirrit bikin, dosten Kurdan ji di vê derheqê de têkevin şikên mezin û bêhêvî bibin. Tiştê ku dostan dît: Kurd nikarin xwe idare bikin.

Ji ber ku şerên navxwe, li nav gund û bajaran dibin, tesireke yekser li civatê dikan. Di civatê de ewlekariya jîyana rojane, a kîrrîn û firotinê, a kar û a her babet pêşveçûnê radibe. Heger dirêj bajo, ji bedêla idara qanûnî de, anarsî di civatê de serdest dibe. Birçibûn û belengazî dibe faktoreke ku li welet ji hemû tiştan pirtir e. Loma şerên navxwe, hilwesandina her babet hêjayî û bidestxistinan e. Tiştê ku bi xwêdana salan hatine bidestxistin û avakirin, wê di cendakî de bîn hilwesandin. Wê bi hezaran welatperwer bîn kuştin. Di şerekî wî de heq û neheq tune ne. Hêviyek tê fetisandin. Ev dijminatiya welet e. Piraniya Kurdan bi vî karê keleşan bêzar in.

Pêşî şer derket û rawestiya, dîsa dest pêkir û dîsa rawestiya. Mam Celal û Kak Masud herdû ji dibêjin ku dixwazin şer rawestînin, lê dîsa dest pê dike. Ev yek him ne şare-zabûna wan a di vê der-heqê de û him ji hebûna desten dijmin e di nav wan de eşkere dike. Lê be guman wê ev şer bê rawestandin. Aşîti heta demekê serdest be, lê şerekî wî her dem dîsa dikare bibe. Heta ku herdû alî, hêzen xwe ên çekdar belav nekin, parastina welet û ewlekariya cîvâfî nespîrin dewletê û hêzen dewletê nebin hêzen xwedî desthilat, dîsa şer dikare dest pê bike.

Ji bo garantikirina hebûna Dewleta Federe û parastina serketinê Kurdan, divê pir ne dereng sê tişt bîn kirin:

1- Piştî ku Dewleta Federe hat eşkere kirin û pê de, pêşmerge ji bo ewlehiya Dewleta Federe bûn xeter û bargiranî. Dewlet û destketiyen din bi pêşmergan nema tê paraztin. Pêşmerge bi xwestina dilê xwe ne, dema nexwazin şer ji nakin û li emran guhdar nakin. Gelek ji wan ji bo aboriya zarokên xwe wî karî dikan. Gelek ji pêşmergen herdû hêlan hevdû nas dikan. Ji ber bûyeren berê û bawerîyen cuda nikarin bi hevdû re kar bikin. Bav û birayen hevdû, hevalen hevdû kuş-

tine. Ev xetereke mezin e. Divê hêzen pêşmergan bîn ベラキリ, ji bo parastina welet, hêzen dewletê bîn avakirin.

Ji hêla leşkeriya modern de, eşkere ye ku pêşmerge nema dikarin welet biparêzin. Pêşmerge ji bo ci ne? Ger ku ji bo herdû alî xwe ji hevdû biparêzin bin, bila herdû ji hêzen xwe belav bikin, nema pêwîst e ku xwe ji hevdû biparêzin ji.

2- Divê serkidayetiya herdû hêzan têbîghêje ku dewletê heye, ji wan bilindir e, divê ew karibe xwedî desthilat be. Ewlekariya welet, rîvebirina her babet karan û yasayı, bê munaqaşe divê di destê dewletê de be. Parlemento û Hukûmet heye, ji bo ci û bi ci desthilatê C. Talabanî û M. Berzanî li ser navê Dewlet û Parlementoyê li vî alî û wî alî dikevin pêwendîyan. Serokê parlemento heye û li gor protokolê ji herdûyan ji bilindir e. Dixwazin kar bikin; bila bibin wezîr, serokwezîr ya ji serokê parlementoyê û bikin. Ger nabin, bila bîhelîn ên ku wî karî dikan derkevin pêş. Ên ku ew kar girtine ser milen xwe, ne karmendên wan bi xwe ne. Ger ne wî be, dezgehêne dewletê ji rûnanin.

3- Divê partî di derheqa rîvebirina kar de xwe di ber dewletê ra nekin, xwe ji dewletê re alternatif nebînin, ji derve dewletê, karen idarî bîrêve nebin û nekevin pêşîya dewletê ku ew kar bi rîve bibe û bibe xwedî otorite. Divê partî, ji qada idarekirina welet derkevin, bila dewlet û hukûmet di vê qadê de bibin xwedî rol û siyaset. Divê partî xwe di ser dewletê re nebînin, divê bîhelîn ku dewlet bibe xwedî prestij û otorite.

Dibe ku ev ne karên hesan bin. Lê ger Kurdên başûr bi rastî dixwazin bi ser kevin û azad bibin, divê karibin van astengan ji pêşîya xwe rakin. Dixwazin azad bibin, divê qebûl bikin ku karbîdesten dînyayê welateki teslimî alîyekî ji wan nakin û idara partîyan ji bedêla idara dewletê de qebûl nakin. Divê Kurd karibin bibin dewlet. Ger Kurd nikarin xwe wek dewlet idare bikin, wê çaxê ya wê hinek din bîn wan idare bikin û ya ji wê bîn firotin.

Weşanênuh

Amed Tigris
B.Welatevîn
Kurteyekî Co-
grafya (bo xwênd-
dinge) Weşanênuh
APEC, 1993, Stoc-
holm, 48r. So-
ranî, wergera ji
Kurmancî bo So-
ranî: Nasir Rezâzî

Farûq Hefid;
Mûzexaney Et-
nografi Kurd Le-
Başûrî Kurdi-
stan da, Weşan-
ênuh APEC,
1993, Stock-
holm, 272 r.
Soranî

Fehed Gerde-
want; Dastanî
Ruh (helbest),
Weşanênuh
APEC, 1994,
Stockholm, 94
r. Soranî, her-
fîn Erebî.

A.Tigris, Nasir
Rezâzî, Fahad
Gardawan; Co-
grafya Kurdistan-
î (ji bo penga-
va navîn û
bilind), Weşanênuh
APEC, 1993,
Stockholm, 93 r.
Kurmancî

Hesenê Metê;
Labîrenta Ci-
nan (çîrok),
Weşanênuh
Lat, 1994, Hud-
dinge/Swêd,
197 r. Kur-
mancî

Hussîn Hebeş;
Li wir lêvîn
keviran çik di-
din (helbest),
1994, Bonn,
137 r. Kur-
mancî, Latînî.

M. Selim
Çûrukkaşa;
Beyrut Gunlugu-
Apo'nun Ayetle-
ri (serpêhatî),
Weşanxaneya 14
Temmuz, Swîre,
330 r.

Hussîn Hebeş
Li wir lêvîn
keviran çik di-
din (helbest),
1994, Bonn,
137 r. Kur-
mancî, Latînî.

Haluk Ozturk;
Hesînayû Hey-
wan, peyvîn me
Pirtûka alîkariyê ji
bo dersen zimanê
Kurdî Weşanênuh
Roja Nû, Stock-
holm, 66 rûpel

İbrahim
Mehmûd; El-
Duktur Qasim
Mîqdad Cemîl
Paşa, 1994
Sûriye, 189 r.
Erebî.

Babê Rojê; Evîn
(kurteci-rok bo
zaroka),
Weşanênuh APEC,
1992, Stock-
holm, 24 r. Kur-
mancî, herfîn
Erebî.

Laleş Qaso;
Daran pel dan
(diwan-1),
Weşanênuh Pelta,
1993, Stock-
holm, 209 r.
Kurmancî.

Bir Kültür Bi-
leşkesi Olarak
Nevruz Gelene-
ği ve Ergenekon
Destanı (Wek Sente-
za Kulturekî Kev-
neşopî ya Newroz û
Destana Ergenekonî),
1992, Ankara, Tirkî,
12r.

Kurdaxî; El
Muslimûn we-
Qeziyet ul-Kur-
diye (Musliman
û Pirsa Kurdi),
Weşanênuh Cudi,
Koln, 1994,
80r. Erebî.

Dilover Mêkerî;
Behsen Fî El-
Seradîb 'En
Knûz El-Kerdox
(Li dûgerîna
gencîneya Kar-
doxan) (hel-
best), Weşanênuh
APEC, 1994, Sto-
ckholm, 72 r.

Joyce Blau; Kürt-ler
ve Kurdistan-eşteşîl
bir bibliyografya-
1977-1990, Mezopo-
tamya Publishing,
Sweden, 1994, 165r.
Tirkî W. ji Fransî: Ay-
tekin Karaçoban

Mahmut Baksi;
Kurt Gözüyle
Yılmaz Güney
(Bi cavê Kurdan
Yılmaz Güney),
Weşanênuh Zêl,
1994, İstanbul,
126 r. Tirkî.

Amadekar: M. Pakdemir

Serokwezîrê Hukûmeta Herêma Kurdistanê Kosret Resûl Elî:

“Şerê birakujiyê gelek zerar da me”

Endamê redaksiyona me Lewend Fırat çendekî berî çûbû Kurdistana Başûr. Ev hevpeyivîna li jér ku bi Serokwezîrê Hukûmeta Kurdistanê birêz Kosret Resûl Elî re çekiriye, hin pirsên şerê birakujiyê zelal dike.

Armanc: *Ev bêtîrî du salan e ku li ser hilbijartin à avakirina hukûmete re derbas dibe à pişti Flad Mahsûm, tu serokwezîrê duwem i, di dema we de hukumetê çend yasa ji parlementoyê derbas kirine à çiqas ji wan bi cî hatine?*

Kosret Resûl: *Ji dema me berpirsiyariya hukmeta herêma Kurdistanê wergirtiye; yasayê partiyên siyasi, yasayê komeyejan û yasayê çekhilgirtinê derçûye û herweha ji dema ku me hukmet avakiriyeye gelek kar hatine kiran. Me karibûye mehê 30 dinar meaşen hemû karmendê Kurdistanê zêde bikin, meaşek wek ikramiye bidin ji bo teqawidê Kurdistanê, meaşen memosteyen Unîversiteyê, mamosteyen enstîtuya, hakiman û doktoran zêde bikin, her mehê 250 dinarî bidin malbatên şehîdan û me dest pê kiriye ku erd li malbatên şehîdan û pêşmergeyên kevin belav bikin.*

Herweha projeyek me heye; alawtin û deranîna petrolê ku pareyek zor hatiye serfîrinê, niha dest bi kar kirene û %50 karê wan encam daye. Projeyek me heye ku elektrîka Sulêmaniyê û Hewlîrê bi xeta bendava Derbendîxan ve gîrêbidin û ji bendava Dûkanê elektîkê bîghînin Dihokê. Di dema ku gelek problemen me hebûn; rewşa aborî xerab bû, bi îptalkirina 25 dinarîn kevin xelkê Kurdistanê milyarek dinar zirar kiribûn û şerê navxwe gelek zerar dan karê me. Lî belê heta di dema ser de jî hukûmeta me li ser kar bû û ji bo sekinandina ser karekî baş kir.

Armanc: *Ji bo rawestandina ser we ci kir? Ser sê mehan dom kir, dibêjin hukûmeta we pasif maye we tiştek nekiriye.*

Kosret Resûl: *Ez nabêjim wekû hukûmet me karekî baş kir. Ez bi xwe 3 caran ji kuştinê xilas bûm ji ber ku ez çûbûm ser bidim sekinandin. Ez çûm herêma Herîr, Şaq-lawa, Hewlîr, Silêmanî û çûm her deverê ji bo ku ser rawestê. Birastî beşek ji wezîran ji li ser karê xwe bûn.*

Armanc: *Lê dibêjin di ser de te à Cewher Namig we cilên leşkerî li xwe kirene û we ser kiriye.*

Kosret Resûl: *Na derew e. Her ev cil (cilên resmî) li min bûn û di dema şerî de ez hertim li gel kak Mesûd bûm. Kak Cewher ji neçûye ser li Selahedîn, li polîbiro mekteb siyasi rûnişûbû. Lî ez ne rû-nişûbûm min kar dikir kû ser nebe. Tu dikarî ji her kesî bipîrsî.*

Armanc: *Di nav Kurdan da dîstînek hete dibêjin Kosret hem di nav hukûmete de hem ji di nav Yekîtiyê de tûj e, tereftarî şerî ye tu di vî warf de ci dibêjî?*

Kosret Resûl: *Ez nebûma dibe ku ser firehtir bibûya. Bi*



Kosret Resûl Elî : “Şerê birakujiyê şerek pir xirab bû û malwîranî bû. (Foto : Armanc)

şahidiya kak Mesûd ku bixwe serokê PDK’ê ye û terefek ji şer bû, di dema şerî de li ser televizyon gotiye ez sipasiya serokê hukûmete dikim ku karekî baş kireye ku şer nebe. Serokê INS Ahmed Çelebi jî gelek caran li ser televizyon gotiye ez sipasiya serokê hukûmete dikim, daxwaz kir û gelek kar kir ku şer nebe.

Armanc: *Sebebê ser ci ye? Di raya gişî de dibêjin YNK naxwaze di 1995’an de hilbijartin çebibin.*

Kosret Resûl: *Na tiştekî weha nîne.*

Armanc: *Vê yekê Kurd dibêjin? Ez 15-20 roj in li vir im, min ji xelkê bîhîstiye.*

Kosret Resûl: *Dibe ku te tenê aliyej ji Kurdan dîtibe. Partî dibêje YNK naxwaze hilbijartin çebibin. YNK dibêje PDK li dijî YNK’ê bi Hîzbullah, Tevgera İslâmî, Îran û Tirkîye re hevkâri kiriye. Ji ber ku YNK bi hêz bûye, xwestine hêza wê kêm: bikin. Ev gotinêner herdu aliyan in.*

Armanc: *Di vî şerê birakujiyê de çend kes hatine kuştin?*

Kosret Resûl: *Heta nuha tu jimartin çenebûye lê gelek kes hatine kuştin.*

Armanc: *Bi texmîni çend kes hatine kuştin?*

Kosret Resûl: *Ez dibêjim lidor 1000 kesî hatine kuştin.*

Armanc: *Ji kîjan aliyi?*

Kosret Resûl: *Ji hemû aliyan an.*

Armanc: *Em bêjin di hilbijartînen sala 95’an de YNK’ê wek 92’yan pir deng negirtin. Hûnê wek muxalafet di parlamento de kar bikin?*

Kosret Resûl: *Na ewê çima pir negrin. 92’ya de ferqa di navbera me û PDK’ê de 1500 deng bûn, yanê kursiyek ji ferq tunebû. Nuka ji diyar nîne ku xelkê deng bide YNK’ê an PDK’ê, an par-*

tiyek din. Meriv ji nuha de nikare bîbêje ku heta 95’an ci dibe ci nabe. Vî şerê birakujiyê rûmeta herdu prityan jî kem kir.

Armanc: *Li Konseya Ewlek-arfyê ya Koma Miletan hewlîdanek heye ku ambargo ji ser Iraqla rabe. Heke ambargo rabe ewê tesfreke çawa li Kurdistanê bike, eger testr negatîf be, we di vî warf de kîjan tedbîr bîn girtime?*

Kosret Resûl: *Du aliye vê meselê hene. Aliye derive û aliye hundur. Aliye derive girêdayî ye bi dewletên dinê û rojava, ewê ci bikin? Ku dev ji Seddam berdin ewê alîkariya wî bikin ku Kurdistanê bigre, yan ambargoyê radikin li hember vê jî divê Seddam jî pirsa Kurdistanê çareser bike û rewşa aborî baştır bike? Ev ne diyar e.*

Aliye hundur ev e ku dema ambargo ji ser Iraqla rabe YNK û PDK şerî hev bikin, rewşa parlamento û hukûmete pir pir xerab dibe.

Lî eger cepha me ya hûndir bi hêz be, em destê hevûdu bigrin wê tu tesirek zêde neke. Ji ber ku moralâ ordiya Iraqla pirr xerab e, muxalefet nav de pirr e, xelk bêzar e, gotinan ji Seddam û rejîmê re dike. Li gor baweriya me heta Gulana 1995’an ambargo ji ser Iraqla ranabe.

Armanc: *Heke Hêza Çakûc wexta wê xelas be à Tirkîye mohleta wê dirêj neke hukûmete we dê ci bike, hûn dikarin xwe biparêzin?*

Kosret Resûl: *Dirêj dikin.*

Armanc: *Em bêjin ku dirêj nekir? Ji ber ku şerê birakujiyê heye DYB dibêje emê dirêj nekin. Heke-weha dom bike emê dirêj nekin.*

Kosret Resûl: *Eger şerê birakujiyî hebe hertiş ji destê me diçe. Ku dirêj bike Îran tê, Iraqla tê, Tûkîye tê, hemû têne û her tiş diçe. Nabe şerê birakuji hebe.*

Armanc: *Ez dema li sükê digeriyam min dî; yê şerê birakujiyê heye. Dî 25’ê Tebaxê de civîna parlamento hebû û ez li vir bûm. Li ser te demançe hebû, gelo ev li gor yasayê ne yasax e?*

Kosret Resûl: *Belê, demançam li ber min bû. Li gor yasayê ne yasax e.*

Armanc: *Gelek rîexistinê alîkariyê hene, gelo koordinasyonek wan*

Bi kurtî jiyana Kosret Resûl Elî

Di 1952’an de ji dayik bûye. Li Bulgarîstanê (72-74) zîreat xwendîye, heta 1975’an endamê PDK’ê bû. Pişti 1975’an li gel YNK’ê kar kir. Di 1977’an de li Hewlîrê hat girtin. Piştre li Hewlîrê rîexistina Komela ku di nav Yekîtiyê de bû çêkir. Di 1983’yan de çû derveyî welêt. Piştre dîsa vege-riya welêt. Di 1988-89 de bû endamê polit-buroyê. Serokatiya gelek şeran kiriye. Bo nimûne; li ser navê Bereya Kurdistanê Şerê Korê* bi rî ve birîye. Di 1992’an de bû endamê parlamento. Di 11.4.93’yan de hukûmeta duwem a Kurdistanê damezrand. Di serhildanê de serokatiya şerê girtina Hewlîrê, Kerkükê kiriye û di 1988’an de di girtina mala Seddam ya li Serêres de serokati kiriye.

Şerê Korê: *Korê gundek e ku dikeve navbera Selaheddîn û Şeqlawayê. Pişti serhildanê, Kurdan ordiya Seddamî li wir dan sekinandin. Tanqîn Iraqê yên gewitî hîn jî li vir in.*

heye an na?

Kosret Resûl: *Beriya ku hukûmeta me ava bi be van her yekî bi serê xwe kar dikir. Hîn jî wan girêdayê partiyen e. Lî pişti avabûna hukûmeta me bi wan re konferanse civand, konferanse li Hollandayê çebû yek jî li vir çebû. Me got divê hemû bi hukûmete re bidin û bistînî. Hinan gotin em nakin, hinan jî gotin em dîkin. Lî belê berî ser hemîyan soz dan me ku li gel hukûmete hevkariyê bikin. Heta berê, dema nûnerên hukûmeten derve dihatin, berê diçün ba partiyen lê pişti hukûmeta me ava bû me gelek kar kir. Nuha dema têr berê têr ba me û em bi resmî bi hev re rûdinin. Heta serokwezîrê Ingilîstanê John Major nameyek resmî bo min şand. Demê heyetek bi seroketiya Lord Jefrya Arthur hat, li parlamento bi resmî teslimî min kir. Têde nîvî-sandîbû ji serokwezîrê Ingilîstanê bo serokwezîrê Kurdistanê. Ev pêşketinê baş bû.*

Armanc: *Li gel vê yekê tiştek bi taybeti bi Swêd ve girêdayî ye, pi-rojeya Qendîl heye.*

Kosret Resûl: *Belê pirojeya Qendîl heye.*

Armanc: *Agahdariya we li ser pirojeya Qendîl heye, tevkariya (koordinasyona) wê li gel hukûmete çawa ye, Federasyona Komeleyen Kurdistanê li Swêdê jî hevbesê vê projejê ye.*

Kosret Resûl: *Pirojeya Qendîl di destpêkê de bi rastî bi partiyen re bû li herêma Dihokê û heta nuha jî tesîra partiyen li ser me ye. Lî me li gel heyeta Swêdî ku hatibû vir qise kir. Heta derecyeke tevkariya wan li gel wezaretî İmar û İskanî heye. Wan di rîya ku ji Qendîl diçe Etroşê de pişkdarî kirin. Lî ez nikarim bîbîjîm sedî sed bi me re hevkariyê dîkin.*

Armanc: *Berî ser hêza INC (Konseya Netewî ya Iraqla) tunebû. Nuha meriv dinêre kontrola riyan hemû ketiye destê Ahmed Çelebi, ev yek jî bo Kurdan ne talûke ye?*

Kosret Resûl: *Na ne talûke ye, ew rola aştiyê dilize.*

Ma Kurd gurên hevdû ne?


Mustafa Aydogan

Sê salên Kurdan û hêviya neteweyekî

Sal 1991, hawara girseyan dihişt ezmanan. Bi milyonan Kurd berê xwe dabûn serê çiyan. Koça milyonan dinya rakiribû ser piyan. Neteweyekî serî hildida. Neteweyekî li hember êrişâ tarîtiyê, bi mîrxaşî di ber xwe dida. Neteweyek di nav ba û bahoza bêhêvîtiyê de, xwe li rohniyê digirt. Neteweyek di bazara mirinê de, li jiyanê digeriya. Neteweyê ku tev li hemû dijwariyan, xwe li hêviyê pêçabû, di bin êrişâ xezeba dijmin de, li perçeyekî welatê xwe berbanga azadiyê zevt dikir. Hêviyên çandî zîl didan; îmkanî çinîna van hêviyan û wergirtina berê vê çinînê, xewn û rastî tev li hevdû kiribû. Neteweyekî hêdî hêdî nîşanî dinyayê dida ku şiyana birêvebirina civakê pê re hebû. Û neteweyê ku ji bindesiya sedsalan off bûbû, di nava malbatâ gelên cîhanê de, ji xwe re li cîhekî digeriya.

Ev tabloya 1991'ê ya ku ji bo "bikaranîna irada azad" rê vekir, hîn jî li ber çavên Kurdan e. Bi saya bûyeren ku ev tablo xemilandin, şertîn Gulana 1992'an hat amadekirin. Di 19'ê Gulana 1992'an de, pêvajoyeke nû dest pê kir; gaveke dîrokî hat avêtin. Li başûrê welêt hilbijartînê dîrokî çedibûn û rîya ku ber bi Kurdistaneke demokratik ve diçû, bi hêvî û bi bawerî dihat vekirin. Şewqa vê hêvî û baweriyê, xwe da her aliye welêt.

Ew roj baş tê bîra her Kurdi/Kurdê. Piraniya civaka me piştgiriya wê pêvajoyê, bê qeyd û şert kir û ji bo parazîna deskevtîn ku li başûrê welêt hatibûn bideşxistin, çi ji destan dihat, texsîr nekir. Teví ku di wê rojê de, li ser awayê birêvebirina hilbijartînan hinek iddia hatin hólê ji her Kurdeki/Kurdeki digot; "Ji bo min kî bê hilbijartîn, ne girîng e. A girîng ew e ku gelê Kurd di dîroka xwe de, cara yekem bi destê xwe, bi irada xwe, bi bîryara xwe, hilbijartîneke azad û demokratik hat nîrxandin. Gelek rojnameyên welatîn cuda yê Ewrûpâye ji bi awakî pozitîv li ser vê bûyerê nîvisin. Di 17'ê Gulânî de, di rojnameya "Dagens Nyheter" ya Swêdê de ji nîvisek bi navê "Ett demokratiskt Kurdistan" (Kurdistanek demokratik) derket. Min wê rojê, ji ber girîngiya bûyerê û ji bo nîşandana hêviyên raya gişî ya Swêdê, ew nîvis wergerand Kurdi û di nava rûpelên Berbangê de weşand. Ev proses li gelek de veren din yê dinyayê bi awayên cuda hat jîyin. Ji ber ku Kurdan di dîroka xwe de, cara yekem di hilbijartîna ku wan bi xwe amade kîribûn de, ji bo xwe deng didan, hem raya gişî ya Kurdan û hem jî ya dinyayê, li hember kil û kêmâsiyan, ji adetê zêdetir bi tolerans bûn. Divê ev helwêst tu carî neyê wê maneyê ku wan hem hilbijartîn û him jî danûstendinê ku di wê



Avahîya Parlamento ya Hewlîrê

Gelo serokê Parlamento ya Başûrê Kurdistanê, mîna serokê organa qanûndanînê ku ji aliye gel ve hatiye hilbijartîn û serokê Hukûmetâ Başûrê Kurdistanê, mîna serokê organa birêvebirinê ku selahiyeta xwe ji organa qanûndanînê wergirtiye, li hember vî şerî ku irada organen hilbijartî nas nedikir û bi qaideyên xwe, hem otorîteya van herdu organan ji ortê radikir û hem jî wan di pratîkê de, bêfonksiyon dihişt, helwesta ku ji wan dihat xwestin, wergirtin? Ma gelo herdu organan di pêvajoya şer de, imtîhaneke baş dan? Jîyanê nîşan da ku di destpêkê de, ne serokê Parlamento ya Başûrê Kurdistanê, bi helwesta muessesebûne hereket kirin. Herduyan jî bi destpêkirina şer ve, berê xwe dan cepheyên xwe, li aliye partiyen xwe cih girtin û bi ci awayî dibe bila bibe, di birêvebirina vî şerî de, wek endamên serkirdayetiye partiyen xwe rol leyistin. Bi kurtî herdu organ jî di vê imtîhanê de, di sinifê de man. Gava ku hêzin din li dij otorîteya wan derdiketin û çek bi kar dianîn, wê gavê herdu organan li ser bingehê bîchîkirina otorîteya organan û qanûnan, bi tundî li dij rawestîyan û ev helwest ji aliye pirraniya Kurdan ve hat paraztin. Lî ev helwest di vî şerî de nehat dîtin. Organen hilbijartî diviyabû beriya herkesi riayetî qanûn û bîryarîn ku wan bi xwe derxistîne, bikirana. Ger ew bi xwe riayetî qanûnan nekin, wê gavê mafêwan yênu ku xelkê dawetî riayetkirina qanûnan dike jî ji ortê radibe. Qanûn divê ji bo herkesi derbas bibin. Ez di vê niqteyê de berê xwe didim serokên herdu organan û dibêjim ku bîchîkirina otorîteya qanûnen ku ji bo herkesi derbas dibin, berpirsiyariya we ye. Her ci dibe, bila bibe, divê hûn li gor vê berpirsiyariye hereket bikin. Divê hûn irada ku gel teslimî we kiriye, nedin tu derverin din. Hûn jî dizanîn ku ji dervayî gel, tu şexsiyet, rîxistin an merciyen ku ji we mezintir in, tûnene. Divê hûn li gor vê statuyê li xwe biniherin û xwe nexin bin tu iradeyên din. Belkî hînek dê ji min bipirsin; "Ma tu ji bo ci berê xwe didi Hukûmet û Parlamento reben û bêcâre?" Ji ber ku bi ya min, berpirsiyariya paraztina otorîteye li ser milen herdu organan e û gelê Kurd hêviya xwe ji eşiran, şexsiyeten bi navûdeng û hêzên cuda bêtir, bi wan organen ku hâtine hilbijartîn û irada neteweyê Kurd wergirtine, girê dide. Herdu organ jî mecbûr in ku li gor hêviyên Kurdan û qaideyên dewletbûnê bimeşin. Belkî ji bo hînekan, herdu organ ji du xaniyên ku ji dema Saddam mane, bêtir tu maneyê ifade nakin, lê ew ji bo gelê Kurd hîn jî kelayen hêviyê ne. Sedemîn ku ez berê xwe beriya herkesi didim herdu organan û serokên wan jî ev e. Gelê Kurd hem parlamento ya Başûrê Kurdistanê, şerî birakujî berê jî şerî de, rewşa herêmî, hewildanen dewletbûnê dîkîm û dilê min jî dixwaze ku ev awayê fikirandinê çewt derkeve. Lî weha xuya ye ku sinyalîn rastiya heyî, li dil guhdar nakin.

Ma "Kurd gurên hevdû ne"? Ev pêşveçûn heta destpêka Gulana 1994-an, bi kullekî be jî dom kir. Lî ji wê wextê û vir de, birînên ku diviyabû bîhata pêçandin, ji nû ve hatin xurandin. Pêvajoyek ku hemû deskevtîn di van hersê salên Kurdan de hatibû bideşxistin, dida ber xwe dest pê kir. Pêvajoyek di bin rona-hiya mejiyekî talanker ku ji bo xwe "mafîn mirovan" dixwest, lê li dijî terefîn din "mafîn mirovan" qet nas nedikir, hat jîyin. Bajar dihatin wergirtin, dever dihatin arîbûn bi dinyayê bidin qebûlkirin "rizgarkirin". Kurdistanê perçekirî ku "Kurd nikarin civaka xwe bi vê carê bi desten Kurdan dihate par-

Hesabên li ser vî şerî hatin kirin

Di pêvajoya vî şerî de, hêzên herêmî yênu ku di "Şerrê Tengavê" de li ba "Hêzên Hevkar" cih stendin û iro ji nişka ve bûn "dostên" Sadîdam, ji bo ku embargoja Yekîtiya Neteweyan ji ser Iraqê rabe, xebateke pirrhîl meşandin û hîn jî dimeşîne. Hemû dewletbûnê cîran, ji bo paraztina "yekîtiya axa Iraqê", rakirina embargoye şert dîtin. Ji wan re firsetek peyde bûbû, êdî dikîm û dilê min jî dixwaze ku ev awayê fikirandinê çewt derkeve. Lî weha xuya ye ku sinyalîn rastiya heyî, li dil guhdar nakin.

Helwesta organen hilbijartî

Di vî şerî de, rewşa herdu organen hilbijartî bala mirovan bêtir dikîşand. Li Kurdistanê, şerî birakujî berê jî şerî de, rewşa herêmî, hewildanen dewletbûnê dîkîm û dilê min jî dixwaze ku ev awayê fikirandinê çewt derkeve. Lî weha xuya ye ku sinyalîn rastiya heyî, li dil guhdar nakin.

vê carê rewş pirr guhertibû; Kurd xwedîyê muesseseleyen neteweyî bûn û civak ji aliye organen hilbijartî û li gor qanûnan dihate birêvebirin. Gelo serokê Parlamento ya Başûrê Kurdistanê, mîna serokê organa qanûndanînê ku ji aliye gel ve hatiye hilbijartîn û serokê Hukûmetâ Başûrê Kurdistanê, mîna serokê organa birêvebirinê ku selahiyeta xwe ji organa qanûndanînê wergirtiye, li hember vî şerî ku irada organen hilbijartî nas nedikir û bi qaideyên xwe, hem otorîteya van herdu organan ji ortê radikir û hem jî wan di pratîkê de, bêfonksiyon dihişt, helwesta ku ji wan dihat xwestin, wergirtin? Ma gelo herdu organan di pêvajoya şer de, imtîhaneke baş dan? Jîyanê nîşan da ku di destpêkê de, ne serokê Parlamento ya Başûrê Kurdistanê, bi helwesta muessesebûne hereket kirin. Herduyan jî bi destpêkirina şer ve, berê xwe dan cepheyên xwe, li aliye partiyen xwe cih girtin û bi ci awayî dibe bila bibe, di birêvebirina vî şerî de, wek endamên serkirdayetiye partiyen xwe rol leyistin. Bi kurtî herdu organ jî di vê imtîhanê de, di sinifê de man. Gava ku hêzin din li dij otorîteya wan derdiketin û çek bi kar dianîn, wê gavê herdu organan li ser bingehê bîchîkirina otorîteya organan û qanûnan, bi tundî li dij rawestîyan û ev helwest ji aliye pirraniya Kurdan ve hat paraztin. Lî ev helwest di vî şerî de nehat dîtin. Organen hilbijartî diviyabû beriya herkesi riayetî qanûn û bîryarîn ku wan bi xwe derxistîne, bikirana. Ger ew bi xwe riayetî qanûnan nekin, wê gavê mafêwan yênu ku xelkê dawetî riayetkirina qanûnan dike jî ji ortê radibe. Qanûn divê ji bo herkesi derbas bibin. Ez di vê niqteyê de berê xwe didim serokên herdu organan û dibêjim ku bîchîkirina otorîteya qanûnen ku ji bo herkesi derbas dibin, berpirsiyariya we ye. Her ci dibe, bila bibe, divê hûn li gor vê berpirsiyariye hereket bikin. Divê hûn irada ku gel teslimî we kiriye, nedin tu derverin din. Hûn jî dizanîn ku ji dervayî gel, tu şexsiyet, rîxistin an merciyen ku ji we mezintir in, tûnene. Divê hûn li gor vê statuyê li xwe biniherin û xwe nexin bin tu iradeyên din. Belkî hînek dê ji min bipirsin; "Ma tu ji bo ci berê xwe didi Hukûmet û Parlamento reben û bêcâre?" Ji ber ku bi ya min, berpirsiyariya paraztina otorîteye li ser milen herdu organan e û gelê Kurd hêviya xwe ji eşiran, şexsiyeten bi navûdeng û hêzên cuda bêtir, bi wan organen ku hâtine hilbijartîn û irada neteweyê Kurd wergirtine, girê dide. Herdu organ jî mecbûr in ku li gor hêviyên Kurdan û qaideyên dewletbûnê bimeşin. Belkî ji bo hînekan, herdu organ ji du xaniyên ku ji dema Saddam mane, bêtir tu maneyê ifade nakin, lê ew ji bo gelê Kurd hîn jî kelayen hêviyê ne. Sedemîn ku ez berê xwe beriya herkesi didim herdu organan û serokên wan jî ev e. Gelê Kurd hem parlamento ya Başûrê Kurdistanê, şerî birakujî berê jî şerî de, rewşa herêmî, hewildanen dewletbûnê dîkîm û dilê min jî dixwaze ku ev awayê fikirandinê çewt derkeve. Lî weha xuya ye ku sinyalîn rastiya heyî, li dil guhdar nakin.

Di vî şerî de, rewşa herdu organen hilbijartî bala mirovan bêtir dikîşand. Li Kurdistanê, şerî birakujî berê jî şerî de, rewşa herêmî, hewildanen dewletbûnê dîkîm û dilê min jî dixwaze ku ev awayê fikirandinê çewt derkeve. Lî weha xuya ye ku sinyalîn rastiya heyî, li dil guhdar nakin.

herkesi.

Divê li gor vê bersiyariyê bête meşandin. Na na, bi vî awayê danûstendinê hêzên Kurdan û karakterê refتariyên wan, jiyandina dezgehê neteweyî yên bi şexsiyet pîr zehmet xuya dike. Ev awayê danûstendinê hêzên Kurdan û karakterê refتariyan, ji bo bîlezkirina pêvajoya dewletbûnê, mîna astengeke mezin xuya dibe. Kurd heta nuha nedewletbûyina xwe, bi xurtbûna hêzên dagirker û menfaetên dewletê ku di siyaseta dinayê û nemaze di ya herêmde de xwedî giraniyekê ne ve girê didin. Lê ez iddia dikim ku ger herkes destûra dewletbûyinê bide me ji em ê bi vî awayî disa nikaribin neteweyê Kurd di seviyea dewletbûnê de, bi rëxistin bikin. Bi vî mantiqê ku tê meşandin, ne dewlet, tu platformeke biçûk ya neteweyî jî pêk nayê. Ger em dixwazin bibin dewlet, divê em wê heyecan û şûra 1991-ê ya ku di bin ronahiya hêviya ber bi dewletbûyinê çûyinê de peyde bûbû, ji nû ve derxine ortê.

Helwesta derengmayî

Hukûmet û Parlamento ya Başûrê Kurdistanê, wek min li jor diyar kir, di destpêka ser de, di dilê wan de ci hebû, bila hebe, lê li gor rastiya ku derket meydanê, li organê xwe bi xwedî derneketin. Parlamento û Hukûmet ancax piştî ser bi çend mehan, li xwe hay bûn û ji bo çareserkirineku di bin siya dezgehê neteweyî yên hilbijartî de, kete nava hewildaneke. Ew helwesta ku diviyabû di destpêkê de bihata wergirtin ku bi derengî be ji hat wergirtin, ji aliye gelekan, ji bo bi şexsiyetkirin û xurtkirina van dezgehan mîna şanseke nû hat nirxandin. Hukûmet û Parlamento ya xebatê rawestiyâ domandin û organan, bîraren ji bo çareserkirinê wergirtin. Hukûmeti di bîrara xwe de, eskere diyar dikir; "Ger ev pirsneyê çareserkirin, yanî banderiya qanûnan neyê bîcîkirin, em ji bo

berpirsiyariya meşandina karê Hukûmetê, ne amade ne." Parlamento ya 25-ê Tirmehê û 15-Tebaxê de, ji bo istiqrara welêt û banderiya qanûnan deklarasyon derxistin. Ev helwesta nuh ya ji aliye van herdu dezgehan ve dihat wergirtin, ji aliye gelek kesan ve mîna ultimatomekê dihat nirxandin. Disa bi saya bangâ serokê Parlamento Cewher Namiq û serokê Hukûmetê Kosret Resûl, ji bo munâqşkirina rîyên çareserkirinê û rawestandina vî şerî, civîna Parlamento ya ku Mesûd Barzanî û Celal Talabanî jî besdar bûn, hat amadekirin. Hukûmetê di wê civîne de, ji Celal Talabanî û Mesûd Barzanî re, daxwaz û pêşniyareñ wan yên ku ji 16 xalan pêk dihat, xwend. Hukûmet û Parlamento bi derengî be ji dest bi ınsiyativgirtinê kirin û pîrsen xwe li Parlamento ya munâqşkirina û li wira biryar wergirtin. Ev awayê danûstendinê, mîna rexnekirina helwesta ku di destpêka ser de hatibû wergirtin ji hat fahmkirin. Ji aliye din ve, bi derengî be ji li Parlamento ya neteweyî civandin, ji li Silopiye, Şîrîn Palasê û Parisê civandinê bastir e. Ez hîvî dikim, ev helwest bê domandin û helwesten ku prestîja van dezgehan daxist, bê mahkûmkirin. Ev dê rîye xurtkirina prestîja wan bêtir veke.

Hudûdê piştgiriye

Kurdan di destpêka pêvajoya ku bi 1991-ê ve destpêkir de, wek min li jor ji diyar kir, bê şert û qeyd piştgiriya xwe ya dilsozi nîşan dan. Lê piştî piştî van bûyeran, derket ortê ku civata Kurd di vî warî de ci qas şiyar be, piştgiriya li ser bingehê welaheziyê dê ewqas fonksiyoneke rast bileyize û ihtiîmalen istismarkirina vê piştgiriye dê ewqas qelstir bibe. Divê bê diyarkirin ku hudûdê vê piştgiriye heta dema ku menfaetên giştî yên neteweyî û nemaze deskevtên ku hatine bi destxistin bê paraztin e. Ew danûstendinê ku şertîn têkçuna

deskevtên neteweyî pêk tînê, divê ne li hêviya piştgiriye bin. Her gava ji bo xurtkirin û paraztina deskevtên neteweyî û ji bo hilanîna van metodêni iptidaî yên ku muhra xwe li danûstendinê hêzên Kurdan dixîne, dê piştgiriya her dilsozeki/dilsozeke Kurd werbigre.

Helwesta hêzên Kurdistanî

Kurd di warê paraztina menfaetên giştî û xwe bi awakî azad û serbixe ifadekirin de, tev li hemû çewti û kîmanîyan, di rewseke baştar de xuya dîkin. Ev rewş di pêvajoya ser de bi teqdîr hat dîtin. Di vî şerî de, hemû hêzên Kurdan kêm ya jî zêde, helwesten xwe yên resmî di bin rona-hiya dersên ku ji dîrokê hatine derxistin, diyar kirin. (Di warê resmî de, ji dervayî terefîn ser, bi tenê sê hêzên Kurdên Rojavayê Başûrê Kurdistanê û hêzék Bakurê Kurdistanê helwesteke cuda wergirtin û raya giştî ya Kurdan ev helwest helwestek mîna helwesten salen 70-yî nirxand.) Lê ji dervayî wan hemû hêzan, bê teref-girtinê, an ji bêl ku li tu súcdarekî gerinê, bi perspektîva paraztina deskevtên neteweyî li dij şerî bîrakujîyê rawestiyân. Ev jî di cîvâkî de, li hember hewildanen terefîn ser yên ku dibin sebebîn bîhêvîtiyê, balansek peyde kir û vîya hêviya cîvakî ya ji bo pêşerojê xurttir kir. Berê, di şerî birakujiyê de, teref-girtin û terefî din bi şerxwaziyê ihamkirin, adet bû. Lê hêzên neteweyî bi awayê danûstendinê xwe, nîşan da ku ew helwesta kevn edî ne helwesta serdest e. Ev divê neyê wê maneyê ku di warê sebebîn ser de ditinê hêzan tunene. Divê ev wek nîşana pêşveçûna di warê seviyea şûra neteweyî de bê nirxandin.

Cîvaka me tev li hertişti, ji bo gavênu ku bikarîn birînan bîpêçin û di cîvakî de, ji nû ve istiqrare peyde bike, bi hîvî ye.

Jİ GERNAMEYA MARCO POLO 5 Li Asyayê

Wergér Jî Swêdi: Mihemed Dehsîwar

Tauris (Tebriz) bajarek mezin e ku bi herema Îraqê (23) ve girêdayî ye; wekî din li vir gelek bajar û qezeyen din yên sabît ji hene. Lê di nav wan de Tebriz bajarê heri giringir û gelê wê pirtir e. Gelê bajêr bi kirin û firotinê û bi endüstriyê ve mijûl dibe. Karê wan icatkirina cure cure şiklén cawê ji hevrîşim ku beşek ji wan bi zêr tê tevnkirin û qîymetên wan gelek biha ne. Rewşa bajêr ji bo dan û sitandinê gelek bi feyde ye û ji ber wê ji gelek bazîrgan ji Hindê, Bexdayê, Mûsîlî, Cremesorê (24) û ji gelek welatên Ewrûpayê ji bo kirin û firotina malen tîcaretê bikin dihatin virê. Meriv li virê karibû kevirên bi qîmet û mircanan bi riheti bi dest bixistina.

Ew tacirênu ku ji welatên din dan û sitandin dikirin, gelek dirav qezenc dikirin û zengin dibûn, lê xelqê cîh bi piranî feqîr û xîzan bûn. Xelqê bajêr gelek tevlîhev bû, ji gelek milet, qewmîyet û ji gelek mezhebîn wek Nestûriyan, Yaqûbiyan, Gûrcîyan, Farisan, Ermînyan û Mihemedîyan ku grûba heri mezin ew bûn û di eslî xwe de ji wan re Tebrizî tê gotin pêk dihat. Her qewmîyetek zimanê xwe cuda ye. Bajêr bi bax û baxçeyan ve haftîye hawîrdorkirin ku fêkiyên heri xweşîrîn ji wan cêdibûn.

Ew xelqê Mihemedi bê bawerî û bê wesa ne. Li gorî bawerîya wan masfî wan heye ku malen kesen ku ne li ser ola wan bin bidizin û bişelînin. Dizîn û şêlandina wiha di ola wan de ne súc e. Lê ger ku kesek ji wan ji teref Mesîhiyan ve bê kuştin an ji lê niheqîyek bê kirin, ew sehid tê hesabkirin. Ger niha ne ji aliye meqamên karbîdesten (25) ku niha li ser wan hukim dîkin ve bihatina sekinandin û ji wan netîriyana, dê ew gelek qetî û súcan bikirna. Ev bir û bawerî ji bo temamî Erebîn misilman re derbasidibe. Dema ew dikevin ber mirinê, meleyek tê ber serê wan û ji wan pîrsa bawerîya wan a ku Mihemed Pêxemberê Xwedê yê heq dike. Ger ew bersîv bidin ku ew bawer dîkin, hingê mele sozê xelasîya wan dide. Pişti wê rihetiye efûkirina súcan ji wan re heq tê dayîn ku ew rezîlî û neheqîyên curbecur bîcîl bînin. Ger ew karibin Tataran bînin ser ola xwe û tê de bi ser kevin, wî mafî di xwe de dibînin ku her súci bikin. Ji Tebrizê heta İranê konaxa 12 roja ne.

Ji Tebrizê ne gelek dûr dêrek heye ku navê xwe ji Barsamo (26) yê miqedes girtiye û bi ibadefen xwe tê dinasîn. Li wirê serokrahîbek û gelek keşîş hene ku cilîn wan dişibin terîqeta Kermelîtan. (Navê wê ji ciyayê Karmel ê İsrâîl tê. MD) Ji ber ku naxwazin jîyanek miskînî û tirâlî bijîn, ewana karê tevnkirina qayışan dikirin da ku ew van qayışan di ibadetan de ji bo melayîketen xwe deymin ser mîhraba dêrê. Dema ku ew li der dorê xwe, li heremîn cînaren xwe ji bo sedequeyan digerîyan (her wiha wek birayen ku di Rûhilquds de tê baskirin), ji van qayışan diyarîyî dosten xwe û merivîn qenc dikirin. Tê gotin ku ev qayış ji bo nexweşîna gikt (kêmgirtina movikan) bas e û ji bo wê ji her kes dixwest ku yeke wisan bidest bixe.

İran berê dewleteke mezin bû, gelek bi nav û deng û bi qewet bû, lê niha ji alîyê Tataran ve hafîye xerakirin û wêrankirin. Li İranê bajarek bi navê Saba (27) heye ku her sê kesen xwey keramet rîya xwe ji wir vegetandin û çûn ku herin ji Nebî Isa re dia bikin. Ew li vî bajarı di her sê tabûten muhteşem de veşartîne. Li ser her abîdeyî avahîyek çar alî heye ku bi awayekî baş tê xwedîkirin. Laşen wan hîn jî xira nebûne û por û ruhîn wan hîn jî wek xwe ne. Navê yekî ji wan Jaspar e, yê din Melchîor e û yê sisyan ji Balthasar e. (28)

Marco Polo di derheqa van her sê kesen xwey keramet de gelek caran lêkolîn kir û ji xelqê pîrsî, lê ewî ji bilî ku ew her sê qral bûn ku li vir di demek berê de hatibûn veşartîn pêştir, tişteki di derheqa wan de ku jê re meselî eşkerekne dît. Lê ji cîhekî ku ji wir rîya sê rojan dûr ewî van gotinê hanê ku ez dê niha ji we re bêjîm sakir. Ew hat wirê û çû keleyeka ku jê re Kela Ataşperîstan (Kashan) tê gotin û maneya wî keleya agirperestan e. Ü navê wir jî rast e, ji ber ku xelqê wirê agir dihebin. Ez li vir dixwazim ji we re bêjîm ka ew gel cîma agir diparêz:

Tê gotin ku di rojîn berê de sê qral ji vî welatî bi rî ketin ji bo ku li ber destê pêxemberekî ku nuh hatibû dînyê tobe bikin. Ü her sê qralan bi xwe re cure cure diyarîyên wek zêr, bixûn û misk birin da ku fîr bibin ka ew pêxember Xwedê ye, yan qralekî dînyê ye, yan jî mirovek e. Ger ewî rahişta zêr ew qral bû, rahişta bixûrê ew xwedê bû, lê ewî rahişta miskê hingê ew mirovek bû.

Têbîni

23) Li gorî Yule Tebriz ticar neketîye nav tixûbîn Îraqê, li gorî wî Marco Polo zanistîyen xwe ji Îbn Batuta girtiye û di vir de şas e.

24) Li gorî Pauthier, Cremessor navek din ji yê Germasîr (an jî Germasor MD) e. Bi vî navî mintiqeyek nêzî Delava İranê, di navbera Şatt ul-Arab û Loristan de tê qestkirin.

25) Yanî karbîdesten wan ên nuh Moxoli... Li gorî Olschki van fîkrîn Marco Polo yêlî li ser rewşa Tebrizê ji reqabeta nav bazîrganen İtalî û Mihemedî ku di vî bajarî de kirin tê.

26) Sankt Barsauma, pîskoposê Nesîbinê yê Nestûrî bû û di sala 458 an de mir. Dêr nêzî Gargar (Gerger) e, li alîyê başûrê rojhîlata Meletê diket.

27) Bajarê Saba yan jî Sawah hê jî heye û dikeve başûrê Tehranê. Li gorî xelqê Sabayê, ew bajar di eslî xwe de berê li ber qeraxê golekê diket. Li gorî vê bawerîye bi çebûna Mihemed re ev gol bi kerameteke ecêp çikiya û ziwapû. Ne dûr ji bajarê Sawahê (Saba) bajarek bi navê Awah heye ku xelqê wê şii ne. Ji ber ku xelqê bajarê Sawahê bi piranî sunnî bûn, di nava her du bajaran de gelek caran şer derdiket.

28) Ev nîvîsa ku tê baskirin (meseleya 'her sê weliyan'), li cem Ramusio Dûmahîk heye

Hunermend Ebdulrehman Kelho

Amadekar: Beşîr Botanî

Ew li gundê Hinis-Nêrwe-Rêkanî-Amêdiyê hate cîhanê. Wî ji piçûkatiya xwe dest bi hunerî kir. Wî sala 1980 akademîya hunerîn ciwan li Bexdadê tekuzkir. Dema ku min kevalen (tabloyen) wî dîtin, min zanî ku ew hunerîn dekî bi şîyan û hest e. Hunerîn dekî Kurdistanî ye û hekariya folklorâ Kurdi ji kevalen wî diyar e. Di gel vê yekê jî, herdem bersivâ demê daye.

Berhemîn wî yên hunerî ji sala 1988-1990 li li serhildana pîroz 1991 hatine dizin û cihê mixabinê ye hîj windane.

Ew naxwaze ku hunerîn dekî navçeyî bîmîne. Wesa naxwaze bîbe amûrek (aletek) bi destê ci siyasetekê. Ji lewra cemawerîn wî gelekin. Xebata wî bî sinûr e. Ü hemû ji bo belavkirina hunera Kurdi ya resen e.

Xwestinek wî heye ku pîşangegheki bi navê JîN li Suleymâniyê veke. Ew karê ji bo jiyanê bi kar tîne û dibêje ku mirov dikare kîrekê ji bo tişten dî bi kar bîne, ne ji bo kuştinê...

Ev hunerîn dekî hîja, niha bi



Çand û wêje

Erê birako! careke dî destê sibê bû. Ji xwe Dr. Poloço her roj sibehê zû ji xewa şérîn şiyar dibe da ku li posta xwe temaşe bike... Di vê pêla dawîn de kar û barê wî û nameyên wî pir bûne.- Xwedana her heft huneran mi, inçiyê wî be...Ax, hejmara nû ya Armancê vê sibê hatiye..!

Bi lez berê xwe dide hêwanê. Fincana qehwê çavnerina wî dike.. De ka em binêrin bê di vê hejmara de jî tiştek heye ku çavnerina wî û şirikê wî dike. Bi rastî ev rojnameya Xwedê nehiştî bûye bela serê her dû dahêneran (!).

Rûpelên siyasî yên pêşin dahênerê mezin bînteng dikin lewra pir li ser wan ranaweste digel ku pêşgotinê wî "çend gotin" di "Nûdem" ê de bûne munasebetekê zêrîn jî boyî pêşkêşkirina zendên xwe yên ramanî û firehiya sîngâ xwe ya siyasî.

Erê! Awira wî li ser rûpelekî ji rûpelên Armancê radiweste, hevkarê wî yê reben- mîvan bûlerza mamostayê xwe hest kir û jê re got:

- Xêr e, ez dibînim ku ji nişkê ve kêfşxweşîya te têkçû?

- Hê, temaşe bik.. Di vê koşa ya "weşanên nuh" de li ser çar pirtûkan ji weşanên kovara min peyivîne digel ku ew bi xwe pênc in.. Erê, pênc in.. û bi Îngilîzî: Five!!

- Pirtûka pêncan kîjan e?

- Pirtûka "Hêz û bedewiya pênuşê" ye...

Min pêşgotinek "pesintijî" jê re nivîsandiye, şirikê min M. Uzun hetanî ku li darê dinê be dê spasiya min bike!! bi herhal ne probleme keko, ew û exlaqêن xwe..

Ev ci li vir nivîsandine:

Ev Qedî Can kî ye, tu bi Xwedê kî??

Em di serdema "nûjenî" û "nûdemî" yê de ne bavo!! Ew hê jî bera dû Qedî Can Paşa didin!!

- Lê Qedî Can wek ku "GORAN" dibêje yek ji wan kesane ku helbesta Kurdi nû kiriye.. Renge tu di navbera wî û Cemîl Qedî paşa de şas dibi?

- Na lo! ih, ih, ih GORAN kî ye Xwedê ji te razî?? Wexta wan çû.. "întelektuel" ha ha, ha va rûpelên edebî xuyanî kîn! ji kerema te re, yek deqe, ez dê sernivîsan bixwînim! pir başe, vê hijmarê koşeya ziman û afirandin nine. Ev ci gotar e ku wusa rûpelekî sax girtiye, ci? Gerdûnist?? De yela ez ê paşê bixwînim, ji xwe belkî ez yekcar ne xwînim! ih, ih, ih..

- Keneki nûjen e!!

- Zor sipas Keko.. "kevirê rojê" ? Haho, ma ev "kurteçirok" bû "Roman" bavo!!

- Erê lo, wek wê "kurteçiroka" dî ya Artur Rimoud ya ku E. HUSEYNî wergerandibû.

- Ha? Erê, Erê, hat bîra min! mebesta te "demsalet di dojehê de" ye, ya ku me di kovara xwe de, di hejmara çaran de, di rûpela 101 ê de li ser nivîsandibû..

Erê, raste keko, ew "kurteçirok" jî li ser rûpelên Armancê pir dirêj bûbû. Ihim, ihm, ihm, bubhir, hema ku ez li ser edebiyata modern bipeyivim ev kuxika min dest pê dike..

- Kuxikek nûjen e!!

- Zor sipas... ihm, ihm, ihm! Erê min dixwest bibêjim ku kurtçiroka bi serî û bê dawî,

Dr. Poloço

Dr. Misto Masto

metodeke nûh e- bi pirtûka min i nûjen "Girtî" dest pê kiriye. Pişt re şûşopa xwe li ser gelek berheman histiye.

- Béguman, béguman wek Rimboud û PAZ û S. J. Pers!!!

- Ji xwe rexnegiran gelek gotarê "pesintijî" li ser wê pirtûka min i pêşin nivîsandibû....

- Ez bawer im ku ji bili gotarê nîne birako! Rexnegirê me yî mezin S. B. Soreklî nîvê wê gotarê li ser vexwandin û pêswaziyê derbas kiribû.. Li ser wê sifra ku te li ser serefa wî amade kiribû; beri çend salan dema ku hatibû Swêdê!!

- Rast e, ew Soreklî nimûneyê rexnegirê "pesintijî" ye. ESIL e tu carî nan û xwê ji bîr nake! Ne wek çend nivîskarê Armancê yên zikreş û hesûd, bi taybetî BAVÊ NAZÊ ku tu tişti naecibîne! lê divê rastî bê gotin. Yek ji sedemân bingehîn ên derxistina "Nûdem" ê Bavê Nazê bû...

- Çawa?

- Wê wextê min koşeyeke piçûk bi navê "peyvîn navdaran" di Armancê de dînîvîsand, rabû Bavê Nazê di nîvîsek xwe de êrîşî min kir. Îca min jî dev ji wê koşeyê û ji Armancê berda û min bîryar stend ku ez kovareke edebî derxînim û li ser bergê wê "peyvîn navdaran" bi cih bikim, navdarê hevalen min!!!

- BIRAVO! Ez bawer im pişte ìca te wêneyen xwe û wêneyen vîla xwe: HÊWAN, pirtûkxane, maseya nazik ya bi şûşeya VODKA hatiye xemîlandin û béguman laliya meyweyan û telefona entîke ya mirov dikare mînaka wê di zencîra filîmê Dallas de bibîne, bi cih kirine....!!

- Zor spas... Bi rastî te hemî sedemân derxistina "Nûdem" ê ber bi çav kirin..

Erê, ma ne erka "Hevkarê" jê hatî ew e ku bikaribe hest û nes-tîn xwedî û berpirsiyare girîşî wer-gerîne!!!

- Tiştek hate bîra min, tu di-bîhişî? Ez bawerim ku di navbera kurte - jîyanâ te de, ya di hejmara "4" an de û di navbera çiroka "çiroka Muxter" ya di pirtûka te yî "Nûjen" "girtî" de wekheviyeke gişî peyda dibe, ew jî nîşana "Realizmê" ye di wêjeya te yî nûjen de, erê! ìca çima tu xwe naspêri ser vê ramana min û tu çirokek nû nîvîsinî:

Em ferz bikin ku çend hejmara ji "Nûdem" ê No "1" û "2" ev hejmaren ku te resmîn vîla xwe di wan de belav kiribûn gîhistin gundê te li "Dêrika Çayê Mazi" û çawan xelkê gund yên ku vê xweşîya te ya li Swêdê dibînin û...

- Ihim, ihm, ihm, ne xerab e Keko! Bi rastî tu hevkarekî jêhaşî yî digel ku tu di danheva peran de sersar temel e jî! Xweska tu havkarê min yê Belçikayê Derwîş Ferho bibîni bê çawan di danheva peran de ji bo min û ji bo xwe jî bêrawestan dixeble!

- Erê rast e, lê ë di danheva helbesten helbestvanen navdar de û

hilanîna navên wan û danîna navê xwe hê jêhatîtir e û ..

- Bubhir, mebesta te kîjan helbest e??

- Helbesta "AZADÎ" ya bi navûdeng ya helbestvanê bi navûdengir "Paul Eluard" ..

- Ne min ev helbest û ne jî min navê vî helbestvanê "Belçikî" di jîyanâ xwe de bîhistine.

- Heq bi te re ye Keko, çunki tu ji bili nivîskarê kurte-çirokê yê wek "Rimboud" naxwînî !!!

- Ihim, ihm, ihm.. Rast e û bi taybetî dema ku min wek helbestvanekî klasîkî dest bi nivîsandinê kir. Min Quran di şes saliya xwe de xitîm kiribû "wek ku min di hejmara '4' an de nivîsibû". Pişti wê hêdi hêdi min xwe berda qada helbesta Kurdî ya nûjen wek Şerko Bêkes malava!!

- Ev tiş ron û eskere ye. Bi taybetî dema ku tu helbesta Şerko Bêkes di hejmara Nûdemê ya 9' an de belav dîkî lê bi navê Sérîn Bozarslan !!!

- Ne problem e Keko.. ya girîş ew e ku nivîskarê "Nûdem" ê abone bin... helbestan ji kuderê tînîn û çawan nav têng hartin ne serêşek mezin e !!

- Ma ku yê abone berhemên ku peywendiyen wan bi helbestê û bi dahênanê tunebin jî bişîne wê...??

- Béguman! Keko! pêwîst e em dilê xwendevanan û dilê abonê xwe neşkinin, pêwîssst e em wan bi pêş xînîn !!

- Tiştekî pîr xwes! Yanî her kes dikare dengê xwe yî kirêt di perda guhê me de biceribîne hetanî ku dawîya dawî bibe deng-bîjekî bilbilane !!

- Béguman, béguman. Ev rîc rîça hemî helbestvanen nûjen e, rîc min bi xwe bû Keko!!

- Herweha êça hemî helbestvanen kovara te yî giranbuha ye û di serî de Zeynelabidîn Zinar e, nivîskarê wê helbesta payedar "XAÇA SAR(!) helbesta ku bi Kurdi li beramberî bijîkîn Swêdî xwendibû û Swêdî pê surdar, mit û mat bûbûn, ne tenê wusa: Dr. Lars Odefors gotibû dê helbeste wergerîn zimanê Swêdî. Ez bi xwe nîzanim çawa dê bijîkîn Swêdî helbesteke Kurdi wergerîne û çima dê wergerîne madam bi Kurdiya wê surdar û mitûm bûye.

- Ne problem e Keko! Min bi xwe jî tiştekî wilô li ser romana şirikê xwe yê nûjen gotibû, ku çawan romana wî bala rexnegir û nivîskarê Tirkîye kişandîye; bîryar ku bê wergerandin, ev mesele...

- Mesela nûjenî û "pesintijî" ye.. Lê bi rastî helbesta ku bala min pir kîşandîye ya helbestvanen nûjen Medenî Ferho ye, ya bi navê "ji bo Yezdan" û...

- Rast e, helbesteke balkêş û eşdar e. Ji xwe helbest ji bo kurê min hatîye diyarî kîn, lê tu kes pê nîzane... Em merivê hev in Keko !!

- Ser serê min! lê xwezka te rîsmê kurê xwe jî ligel helbeste

belav kiribûya..

- Na Keko na. Miletê me wek ku şirikê min M. Uzun dibêje miletekî paşmayî ye.. Wa min resmî xwe belavkiriye em ji devê xelkê xelas nebûne !!

- Erê.. Heq bi şirikê te re ye. Bi rastî em miletekî pasdemayî ne, nezan in. Ji saristaniyê famnakîn û tu tiştekî ji nûdemîyê û nûjenîyê tênağîhêjin!!

- Lê bi vê munasebeta ku em li ser risman dipeyivin, şirikê min yên dahêner dibêjin ku rîsmî min di hejmara '4' an de ji yên hejmara dîtir xweşiktir e, tu ci di-bêjî ??

- Na..Na, ez ne bi wan re me. Çinkî rîsmî te yê ku "Fanêre" di bin gumlek de xuyanî dikir bi gelekî xweşiktir bû.. Wê gavê tu pir ciwan û zarok diyar dibûyî Keko û...

- Lê mixabin ku fêdeya wê ya hunerî, çandeyî û wêjeyî pêkne-hat. Çunkî şekirîna porê min di wî rîsmî de ne nûjen bû, wek rîsmî hejmara '4' an ya..

- Eger wusa be, heq di destê te de ye, çunkî di "sîswarkirina" por de tu dahênerêkî bê hempa yi !!!

- Zor sipas! Ihim, ihm.. Tu rastiyê dixwazî, çap-kirina wêneyan di kovarê de hiştiye ku em nema di ber helbestan de bîhêjin. Çinkî ez bi xwe hînekî ji helbestê bi girêk im (kompleks), min bîryar stend ku ez pir kêm helbestan belav bîkim, ew jî, bi awayî ne belavkiri-na wêneyen helbestvanan. Hetanî ku helbestvanin mezin bin jî wek Medenî û "Eskerî" ! Ferho !!

- Ev ci ramanek dojehî ye ! Hi, ma gelo di vê bîryara xwe yî hêja de tu bi serketî ??

- Min bi xwe ramana xwe di hejmara '4' an de pêkanî.. Lê helbestvanan di cih de protesto kîn û min agahdar kîn ku eger wêneyen me neyên belavkiri em dê abonetiya xwe rawestûnîn ?

- Ez bi xwe, ji Xwedê re dibêjim, hejmara ku bîriqandiina serê Xelîl Dihokî û tîrîjîn ronahîyê yên serê M. Uzun (li ser bergê pêşin yê pirtûka Hêz û Bêdewiya Pênişê zelaltîr e) û dîmenen (...) yên ku di çenê bdîmenê bazirga-nê kole û reşan de ye, tê de nebînîm, kêfşwes nabim ...û..

- Ü rûyê 'herî xweşik yê rûxweşê Zivar e, ih, ih ih !!!

- Em bi xwe, wek xwendevanan, awayê awirvedana te besî me

ye...!! wek pêşniyâr ez tu cari naxwazim ku tu rîsmî xwe bugherî! Lê bi rastî min dixwest ku ez pirsekî ji te bikim:

Çiroka van lêbûrînê ku her-gav bi dû belavkiri-na helbesten Rojen Barnas de têne qine?

- Nûdemê wek ku tu dizanî lin-gêñ Rojen Barnas careke dî şemitanin qada nîvîsandinê. Îca daku em wî wek helbestvanekî balkêş û nûjen û payedar bidin xuyanî kîn, gerek di her hejmara de em lêbûrînê bi helbesta wî ve bizelqînin. A din jî tu dizanî ku min çend helbestvanen demsalane ji boyî Nûdemê çeki-rine, yanî her ku Nûdem nêzîkî derketinê dibe, ew jî dest bi derx-istina helbesteke dikin, ez wê ji çapxanê derdixim ew jî wê ji girtîxanê derdixim... Îca ez naxwa-zim wan helbestvanan ji destê xwe berdim yan jî dilê wan bîhîl-im. Ma te lêbûrîna hejmara 10'an ya ji bo Rojen Barnas nexwen-diye? Digel ku şasîti pir hûr bû jî min lêbûrînê berya her tişti amede kiribû, wek nîmûne peyva "tewakulê". Ma tu me'na wê dizanî Birako ?

- Tewkeliya te jî bi Xwedê ey xwendevanê reben !!!

- Bi rastî gerek Rojen Barnas hemda rebê xwe bike ku problema wî tîpek yan jî du tîp in. Ne wek nîvîsîn kovarê yê dîtir ku ji pirbûna şasîtiyê çapê mirov serî li lingan nasnake...ha..ha..ha !!

- Di baweriya min de, eger, wek hemî kovar û rojnameyên nûjen û ne nûjen redaksiyonê kovarê hebûya dê ev şasîti kêmîtir bûna, herweha dê xwedi û berpir-siyarê gişî gewil û moralê xwe yê ekzotik kêmîtir bi kar banya .

- Keko, eger careke dîtir tu peyva redaksiyonê bînî ser zimanî xwe, ez dê "hevkarî" ya te, wek yê berî te, rawestînim. Rast e, tu abonetiya xwe ya salane bi rîkûpêkî û di wextê xwe de didî, lê ev nahê wê manê ku tu bîrû-baweriya xwe li ser her tişti bidî, ma beriya 60 salî redaksiyonâ Mir Celadet hebû? Piş re, ma te tişta ku Sebrî Botanî li ser min gotiye nexwendiye:

Celadet bi Hawara xwe tenür dada Cewerî bi Nûdema xwe nan pêveda

- Belê, min xwendîye.. Lê ey Dr. Poloço tîka dikim ku tu jî, di rojnameya ku di nav destê te de, Dr. masto ya bi sernivîsa "Gerdûnist" bixwînî!

Dilopek....

- Divê berdewam bike, tu vê yekê binası, eger ku tu ji min hez bikî an na, ezê li ser hezkirina te çavan bidim hev, û

Dilopek Baran

Pir Rustem

Piştî panzdeh salan vegeriya Sûriyê. Bê ku ti tişti bi xwe re bîne, ji bili valahiya solek avêtî û bîranîk kûr ku di dil de şin bûye û ji ber ku tu name, ji merven xwe re bi rê nekiribûn, ti kes li hêviya xwe nedît. Ji balefirgehê bi derket dest ji teksiyekê re hilda û ji ajovan xwast ku wî bigihîne taxa (çiyayê Seydo).

-Hîna wek berê ye, ti tiş ne hatî guhartin ji bili min û bi daketinê re naskir ku bê hiş ji ajovan xwestî, wî li ber mala wiya berî panzdeh salan deyne. Piçekê di cihê xwe de ma sekinî keserek kûr kişand li ruwê xwediyê dikanê nihirî, ew nas ne kir, lê mîna çîruskekê di mejiyê E. Miço de pêket.

Dirêjkirina sekinîna wî ya tevizî, hiş bala xwediyê dikanê, ber bi wî bê kişandin. Çavêن wan bi hev dikevin, bîrên bîranînin kevin têvîn vedan. Por û rihêni sipî reş di-vegerin û gava ew kenê çêkirî ji aliyê Bêkes de di nîvî de tê birîn. Bi hev re xwe davêjin himbêza hev. Çend kuzot tozê têvîn kuştin... serjêkirin û di kenê wan de winda dibin. Demek dirêj bê dengkirin dimînîn û piştî ku têr hevdû bîhin dikin, ji hev bi dûr dikevin.

-Ez dixwazim derkevîm jor. Bê ku li rewşa hevdû bipirsin E. Miço ji Bêkes xwest ku ew derkevin oda jorî dikanê û dema E. Miço xwest di deriyê bînayê re derkeve hat bîrê ku pêpelok ji hindur dikanê ji dertêñ odê. Ji nuh ve vegevî û ket pey Bêkes her ku pêpelokekê li jêrî xwe dihêle, bi salekê şûnda divegere. Bi hejmarta panzdeh salan re kenî, hêş Bêkes jê bipirse.

-Tu bi çi dikenî?

-Bi te...bi xwe. Li dawiyê em giş bi hev dikenin. Bi gotina dawî re, çavên E. Miço tiş hêşir dibin. Rojêñ buharê bi hêrs digrîn, deziyê baranê- hêşra ji pey hev kêm nabe û dihêlin bîranîna kûr ya ku di dil de şin bûye serî hilde. "na...ez bi te digrîm, ez ji te hez dikim."

Bi van gotinêñ ji hev ketî, Bêkes wî bi ber xwe ve dikişine. Naskir ku ew wegerîn berî nuha bi panzdeh salan û xwast ji pêş pirsa wî bireve. Ew xweş dinase, ku ew pirs wê bîhêle herdu bi binê benê werbin, bi ser darê benîştokê vebin. Lê E. Miço destêñ wî, ji ên xwe bemedan.

-Ra...ş...êl, derketina navê çûyi, hêş demek dirêj bi hêşra bê şewitandin. Bêkes bîhna kiziran-dina goş kir.

-Tu dîsan destêñ xwe, bi agirê cixaran dişewiûnî.

-Tişten miş...Xalî naşewite. Babetê neguhêr di van salan de çi bû û ew li kûye. Bêkes dît ku xwe ji bin barê pîsê bide alî û naskir ku ji bili rast-gotinê, ti rê li pêş wî tinene. Lê gotin pê re dernakeve û gava li çavêñ wî nêhî, bervê xwe jê guhart. Heya nehêlibe hêşir û gotina "mirinê" di çavan de bixwîne. Lê E. Miço nihirî ku gorek di odê de şinbû û dengê wî yê, ku ji bin berfa mezin diherikî, Bêkes tevizand.

-Ça...a...wa, bi dengekî ricifi, gotin û çend didan, ji devê wî weşin.

-Xwe ji balkonê de avêt. Bi bîhistina avêtinê re, çend dilop xwînê / baranê di bêvlîn E. Miço

re avêt. Hêştin çend gangîş sor di kefa destê Bêkes de , bi pişkuvîn. Bi rûniştina wan re, di nav tişten dikanê de Bêkes du cixare vêxistin.

-Ji kengî ve dengekî dûr, ji binê (VOLKAN) a derdihat.

-Piştî çûna te bi du mehan gotinê wî keneñî zor, bi bê dengeyê hate vemirandin. Ji hunava E. Miço weşand.

-Panzdeh salêñ, ji bili vê hêviyê... bîranîna kûr, ya ku di dil de şinbûye tinene. Çima...û bi pirsa birî re, demek dirêj bê deng dimînîn. Min bi tenê bi hêl. Bêkes xwest li cem wî bîmîne û xwesteka wî bi cih nîne. Lê dît berger bê sûdye. Ew hişt û bi ga-vin çelmişî daket dikanê.

E. Miço piştî ku bi çend cixaran dem kizirand. Çavan ji nav lingêñ xwe radike. Diwarênuh boyax-kirî kevin divegerin, boyax ji hin cihan dikeve û li şûna wê kaxezêñ rojnama, li ser çar dîwar û banê odê belav dibin û hin gul/solin çelmişî, di ruwê dîwêr de hatine çandin. Dem divegere berî panzdeh salan.

-Ka bi qulêp aliyê din çêtire. Bêkes ji dixwaze, ku kaxezâ roj-namê bi qulipîne aliyê din. Ji ber ku li wî alî wêneya keçikekê heye.

-Çavêñ te ji bili keçikan , ti tişten din nabînîn.

-Ma yên te hertiñ ruwê Xwedê, di wan de şinbûye û bi kenê wan re derî tê kutan.

-Kenê we heya bi zukakê diçe ee...ew û mîna zarokan xwe bi banî de çendike.

-Hêdika keçê tu dibînî, ku banê odê li gor dirêjiya mirove, bes ji ku tuyê bigihîne ban. E. Miço jê re got. Lê gotinêñ xwe yên dawî di nav porê Raşêl de çandin. ji ber ku bi vekirina derî re û çêkirina xwe re ew, bezibû hembêza wî û mîna pisîkan xwe di hembêzê de veşart. Hinekî wilo bê deng man û ji nişkave ken bi wê ket. "Tu bi ci dikenî?"

-Ez bi te dikenim ku mîna direkan sekiniye. Raşêl vegerand.

-Ne xeme, eger tu bi min dik-enî. Ez ji bi te digirîm û bi vê si-warkirina biyanî, ji hevokê re. Ji aliyê E. Miço ve hersê kenîyan.

-İro bû du car, vê gotinê tu ji min re dibêji. Xweyaye gelekî se-riyê xwe pê bilind dike. Hevoka dawî gote Bêkes.

-Haa hîne bîhna wî di bêvilêñ te ziwa nebûye te dest ji xwendina xwe berdaye û tu ketî dû wî. Bêkes bi henekî li wê vegerand.

-Eger dilê te bi me mayî, here balîvîkî têxe hembêza xwe û bi gotinêñ xwe re , wê xwe di hembêza E. Miço de melisand û hêdî -hêdî ber bi nivînan meşîn mîna ku di xewê de bin. Bêkes dît ku rîexistina kaxezêñ rojnama, li ser dîwêr çû demek dîtir. Wî ji bi nerîm derî li dû xwe girt û ji odê bi derket.

-Ez ji te hez dikim. Raşêl got.

Di jiyanâ xwe ya, ku E. Miço si sal jê şewitandin, hîn ji vê hevokê û bi hesta, ku ji devê Raşêl dertê nebihiştî her ku ev hevok di bîhist çend nêrgiz di dilê wî de dipiskivin.

-Bi rastî bi dev li ken lê vege-rand. Wê ji bi çend kule- mistan bersiv da: "Bes.. keç.. ez ji te hezdi-kim."

Dûmahîk r.8

Kevirê Rojê -VII

HILWAYIZ, PIRSIVON, MARÎ, de di dawî de rûyê xwe yî rastin nişan bide daku ez rûyê xwe yî rastin bibinim, rûyê yên ditir,

rûyê min ku rûyên me ye, rûyek bo hemîyan, rûyê darê û nanopêj, rûyê ajoval û ewr û deryavan, rûyê rojê û cobarekê yê (POTRIS) û (POLIS), rûyê yekbûyi yê hevparane.

De rabe ser xwe, ha vaye ji dayik dibim: jiyan û mirin

di te de hevkariya xwe dikan, ey xanima şevê, ey birca ronahiyê, ey şahzadeya berbangê, ey keçe-qîz a heyvê, ey dayika avêñ dayik, ey laşê cihan, ey xaniyê mirinê,

ji roja ku ji dayik bûme bê dawî dikevîm,

dikevîm nav xwe de bêyi ku bigihêjim kûrahiya xwe, min di çavêñ xwe de bicivîne, toza tarûmarker bicivîne û xweliya min pîroz bike,

hestiyêñ min yên ku hatine bîrîn vege-rîne şûna wan, bîna xwe berde laşê min, min di axa xwe de veşer, da ku bêdengiya te aşîtiyê pêşkêsi ramanê bike ramana ku li beramberî xwe serfildide, de mista xwe raxîn ey xanima tovan ya ku roj in, roj nemir e, hiltê, geş dibe, anuha ji dayik dibe û hergîz dawiya ji jidayikbûnê nayê, her rojek ji dayikbûnek e, û her berbangek ji dayikbûnek e ez radiperim, em giş radiperin, roj radipere di rûyê rojekê de "cin"bi rûyê xwe yî ku rûyê "cinane radipere, rûyê gişan e



ey dergehê bûnê min şiyar bik, de tu beyanî bi,

bihêle ku rûyê vê rojê bibinim,

bihêle ez rûyê vê şevê bibinim,

giş tevlîhev dibin, ica rû têñ guherandin,

ey kevana xwînê, ey pira jenê,

bi destê min bigir û min biguhêz rexê dîtir ê vê şevê,

ku ez tu me, ku em em in,

di şaneşîniya navê tevlîhev de,

ey dergehê bûnê; hebûna xwe vek, rab ser xwe,

fêrî bûnê ji bibe, dîmenêñ xwe bikol,

rûyê xwe derman bik, çavêñ xwe nû bik da ku tu li rûyê min temâşe bikî û ez ji li rûyê te,

da ku hetanî mirinê tu li jiyanê temâşe bikî,

ey rûyê deryayê, nan, gaberd, çavkanî.

ey cavkaniya ku rûyên me di rûyekî bê nav de dihilîne, di bûnewerê bê rû de, di

amadeyiya ku bi amadeyiyan bê saloxdan hatiye dagirtin,



dixwazin hêjî biçim, dixwazim biçim ber bi dûrtir de

lê nikarim:

kêlîk di yek dîtir û dîtir de hat dehfdan,

xewnen kevireki ku xewnan nabîne ketibûm xewê û

piştî çend salêñ di çesnê keviran de

min bihîst ku xwîna min i zindankirî distirê,

û deryayê bi xireçirek ronak dest bi sitranê kir,

û yeko yeko keleb radest dibûn, hemî dergeh diherifin

û hetav ji boyî talanê di bin eniya min re baz dida,

çavêñ min ên girtî vedikir,

Hebûna min ji çermê wê rût dikir,

min ji nava min bilindikir, min ji

xewa min i dijwar cihê dikir, xewa ku serdemêñ kevir û sih-

ra

neynikê wê jiyanê vedigerîne bo

sengebiyek kirîstalîn, sipîndarek avîn

Bayê nefûreyeke avê û bilind çemandiye.

Dareke reh daçikayî digel ku bi samagerî xwe li badike

bi rîveçûna cokekê dizîvire, diçive

û herdem dighêje:

Dawî

Wergerandina Ehmed Huseynî

Çavkaniyêñ wergerandinê:

-Azadiyek merckirî- Erebî

Wergêr M. Eli Yûsîfi

- Kovara Derwaze hejmar 1, sal 1993, bi Soranî

Oktavio Paz



her prosesek atrandî, wek hemû çêkirinê mirov berhemek dîrokî ye ango derbirîna(tabîra) cî û demekê ye lê di eyî wextê de tişteke, dîrokê berz û serbilind dike û di kêlikê de, ku ev kêlik berya hemû dîrokan e, şûna xwe digre. Di destpêka destpêkê de, dîmek çame berya dîrokê ye, herweha ne li derî dîrokê ye. Çame berya dîrokê ye çunkî nimûnedarek giranbuha ye û ji dîrokkirinê re asê ye û destpêka reha ye (mutleq), dîmek giştî û xwe yî (zatî) ye, xwe bi xwe tîrkirî ye. Çame di dîrokê de ye, bi angoyek dîtir ew bi xwe dîrok e. Eger ne di jidayikbûneke nûjen de be najî û eger ne di wê dûbarekirina ku derbasî kêlikâ rizgarkirina helbestî de be ji najî.


Dîmek bêyî dîrokê an bêyî xelkên ku kakila dîrokê pêktînin, ku çiyatî û mebesta dîrokê pêktînin (mahiyet û xayet) ne çame ji dayik dibe û ne ji berceste dibe. Herweha bêyî çameyê ji hebûna dîrokê nîne, çunkî bê çame em çavkanî û destpêkê wenda dikan.

Oktavio Paz


FERHENGEKÊ KIRDKÎ (ZAZAKÎ)-AVESTAKÎ-KURMANCKÎ

MALMÎSANÎJ

Avesta, kitabê pîroz (muqeddes) ê Zerdeşti yo. Ziwanê nê kitabî ra Avestakî (Avestayî) vajiyêno. Texmînan gore Zerdeşt bi xwi verê 'Isay seserra hewtini di ciwiyawo. Labelê 'eslê kitabê yê bi xwi nêmendo. Kitabê Avestayo verin o ki ewro esto, 'Isay ra pey seserra 13. ra mendo. Ziwanê Avestakî ra zaf kelimey ziwanê Kurdkî û bi taybeti zî lehça Kirdkî (Zazakî) manenî. Tiya di ez nê keliman ra çend nimune-yan nusena. Vêşaney nê keliman mi notanê xwi ra -notê ki mi serra 1984-1985'di Paris di dersanê mamosta Le Coq'i di, dersanê "Initiation à la philologie iranien" di nuştîvîjnay. Çend teney zî mi tanî kitaban ra vîjnay (1). Mi kelimey Avestakî zey telaffuzbiyâşê yîni û ebi elîfba Kurdkî nuştî.



Tadyey Avesta bi Fariskî



Yew riperrê Avesta

Hûma (Homa): Di kelimey Avestakî kelîma "Hûma" (Homa)'y ma-nenî: 1-Yîma: Hûmayê nîzam û intîzamî 2-Haoma: Vâşedo pîroz o. Beno ki kelîma "Hûma" yê kelîman ra yewî ra bimano. (Hûmay: Bi Kurmanckî Xwedê)

şaristan, şehir: Na kelîma, kelîma Avestakî "xşasra" ra yena. "Xşasra" ziwanê Avesta di yena me'nâ hêz û iqtidarî ("S" yê "xşasra" nermkanî vajiyêno). Ziwanê Medan di zî na kelîma "xşasra" ya.

(1)Biewnî: Avesta Kohnterîn Sorûdha vo Metnhayê İranî, c. I, Gozareş o pêjûhes: Celîl Destxah, 1370, s. bîst o yek, bîst o çehar - bîst o şes

-Pordavud, Yaddaşhayê Gasaha, Tehran, 2536 şahinşahi

-Pordavud, Ferhengê İranê Bastan, Tehran, 2536 şahinşahi

-X. Delamarre, Le Vocabulaire Indo-Européen, Paris, 1984

-Dr. Muhammed Mukri, "Introduction" in: Ziyauddîn Başa el-Xalidî, El-Hedîyetü'l-Hemîdiye Fi'l-Luxetü'l-Kurdîye

-Iosif M. Oranskij, Les Langues iraniennes, Traduit par Joyce Blau, Paris, 1977

(2)Tanî vatanê verênan di wina vanî:

"Deli sipa bibo, kutik Bexdad ra yeno."

"Deli sipi bo, kutik Heleb ra yeno." (Biewnî: Malmisanij, Folklorê Ma ra çend Numûney, Wesanên Jîna Nû, Uppsala, 1991, s. 138)

Kirdkî (Zazaki).....Avestaki.....Kurmanckî

adir.....	atarş.....	agir
amina.....	hamina.....	havîn
aste, este, kate.....	ast.....	hestî
awe, awi.....	ap.....	av
berdene.....	ber.....	birin
bereno/beno.....	barat.....	dibe
bî, bi.....	bût.....	bû
bindi.....	hêç.....	ji binî, hîç
bû, bûy.....	bavdha.....	bîhn
cenî, cinî.....	cenî.....	jin
çar, çehar.....	çaswar.....	çar
çinêbi.....	nêbüt.....	tunebû
des.....	dasa.....	deh
dest.....	zasta.....	dest
deve.....	uştra.....	huştir, deve
dewe, dewi.....	daînu.....	dih, gund
deyra.....	zray.....	derya, behr
dêv.....	daîva.....	Xwedayê xirabıyê, dêv
di, didi.....	dva.....	du
dîn.....	daêna.....	dîn
dûrî.....	dûr.....	dûr
esto.....	astî.....	heye
estor/estore.....	aspo.....	hesp
ez.....	azem/azim.....	ez
game.....	gaman.....	gav
germ, garm.....	garama.....	germ
her.....	xara.....	ker
heşt.....	aşta.....	heşt
hewn.....	xvafna.....	xewn
hewr.....	awra.....	ewr
hewt.....	hapta.....	heft
hîrê.....	srî.....	sê
howl/hewl/hol.....	hu.....	baş, qenc
huner.....	hunara.....	huner
Husk, wuşk, wişk.....	huşka.....	hişk
kam.....	ko.....	kî (Bi Kurdiya Başûr: kam)
keyna.....	duxzer.....	dot, keç
lac, laj, laz.....	pusra/pusro.....	pis, law
ma.....	ahmî.....	em
new.....	nava.....	neh
nimaj, nimac.....	nomangha.....	nimêj, du'a
panc.....	pança.....	pênc
perr.....	parna.....	perr
pêr, pî.....	pîtar.....	bav, bawk
pêro, pirr.....	paru/pouru.....	pirr
pird.....	piritu.....	pir
pîley, girdey.....	maso.....	mezinî
ra.....	haça.....	ji
roşna.....	raoxşna.....	ronak, ronî
sard/serd.....	sarita.....	sar
se.....	satam.....	sed
sipa (2).....	spa.....	seg, se
sırasnaye/şırasnaye.....	srûtam.....	naskirî, bi navûdeng
şamî.....	xşefnye/xşafnye.....	şîv
şeş.....	xşvaş.....	şeş
şewe.....	xşep/xşepa.....	şev
tani, germî.....	tefnu.....	têhn, tîn
teyşan.....	tarşna.....	tî
va.....	vate, vait, garavan....ba	
vat, va.....	mraot.....	got
vera, ver.....	vî.....	ber bi, hember
verî.....	para.....	berî
vîşî.....	vîspa.....	tev, hemî
wes, weş.....	vohu.....	baş, xweş
yew.....	aêva.....	yeş
zanayîne, zanayîş.....	zan.....	zanîn
ziya (ziyan ... resnayîş)...ziya.....	ziyan gîhandin, ziar	
gîhandin		

WERİ XANÊ

Arêkerdox: Seyîdxan KURÎJ

Weri Xan, weri Xan, weri Xanê, Xanay min
Weri can, weri can, weri canê, canay min

Xanê, baxçe bîye dûno, Xanay min
Bîye bîye müşmisûn a, ti b' canay min

Mışmiş werê gergüş o, Xanay min
Mışmiş o tal û tirş o, ti b' canay min

Xanê, bîye emsi meşuve, Xanay min
Dayk çîk poto çîko weş o, ti b' canay min

Weri Xan, weri Xan, weri Xanê, Xanay min
Weri can, weri can, weri canê, canay min

Canê, baxçe bîye dûno, Xanay min
Bîye bîye xiyarûn a, ti b' canay min

Xiyar werê keynûn o, Xanay min
Xiyar werê rindûn o, ti b' canay min

Weri Xan, weri Xan, weri Xanê, Xanay min
Weri can, weri can, weri canê, canay min

Xanê, baxçe bîye dûno, Xanay min
Bîye bîye zebeşûn a, ti b' canay min

Zebeş werê xwertûn a, Xanay min
Zebeş werê rindûn a, ti b' canay min*

*Ina deyîri veyyûn di yena vatîş. Mi yew dewa Çewlig (Bîngol) ra day arîye.

XUMXUME

Arêkerdox: M. LİCOKİC

Xumxumê, to rê vana
Delalê, to rê vana
Ti nêbê ez nêvana

Keynay 'Eflî Şe'banî
Kevokê serê banî
Ti nêbê ez nêvanî

Xumxumê, to rê vana
Delalê, to rê vana
Ti nêbê ez nêvana

Xumxum keynay keşîşî
Delal keynay keşîşî
Ardî serey min işî

Xumxumê, to rê vana
Delalê, to rê vana
Ti nêbê ez nêvana*

*Mi na deyîri dewanê Licê ra Licoki di eşnawita.

Kitabêdo
newe
vejiya!

MELA EHMEDÉ XASİ

MEWLÜDE NEBÎ

BI ZIWANÊ KURDİ (ZAZAKÎ)

Tadox (Werter) Tipane 'Erebî ra: Mihani

WEŞANÊN FIRAT

Bersiv û Daxuyaniyek

Hemid Kilicaslan

Ev daxuyaniya jêr çendekî berê ji me re ji hatibû şandin.

Büyarên weha li Kurdistanê ne cara pêşin e diqewimin. Em hêvîdar in bûyâren di vê daxiyaniyê de hatine diyarkirin û yên weha ji rêtixtinê Kurdan re bibe tecrube da ku bûyâren weha careke din neqe-wimin.

ARMANC

Min ji zû de dixwest ku li ser hin bûyâren taybetî, bi hin kes û rêtixtinê bawerî li wan têr, re bipeyîvîm. Yan ji hin kesen cihê baweriye li ser rewşa malbata min doza daxuyaniyan li min bikiranaz ez amade bûm ku min dîtin û zanîna xwe pêşkêşî wan bikira. Lî mixabin tu kesî heta niha ev doz li min nekir. Ez, wek welaperwerekî Kurd, nuha ji bo her kes û rêtixtinê welatparêz, ji bo hevpeyvîn û dozen di vî warî de li min bêne kirin, bi dilekî fireh amade me.

Min pêwist dît, li hemberi paşgotinîyê li ser min têne kîrin, rohnikirin û jihevveqetandina karên polîtikî û malbatî, bi tevayî li ser rewşa malbata min, daxuyaniyekê rabigîhînim ber destê kurdan.

Di vê dema dawîn de hem bi nîvis û hem bi gelek paşgotinîyêni jî der dora APO'yan bi tevayî li ser malbata min û bi taybetî li ser min ku têne belavkirin, bi derengî be ji hîst ez vê bersivê bidim.

Piştî hilbijartînê 27-ê Adara 1994-an yên li Tirkîyê van paşgotinîyê li ser min bi berfirehî berdewamkirin. Li gor wan paşgotinîyân; goya "rahiştina çêkê dewletê û tevgera malbatê ji ali min de tê birêvebirin". Wek, yekî xwendiyê de paşgotinîyân dûr û dirêj nas dike, eger tenê bersivdan peyvîn wan ba, min tu pêwistîya bersivê nedidit. Lî piştî hinde peyv û belavkirin ku dilê doston ji şolî dike, min dît ku bersivdanek pêwîst e. Ji bo ku rê li tevlihevkirînê piştî bersîva xwe bigrim, ez dixwazim bi çend gotinan dîtinê xwe binivîsinim. Hêvî dikim ku nîvisara min yeker bê girtin, ci çapemeniya kurdi ci alîgirîn dîtinê siyasi û ci kesen serbixwe be, nîvisî bi tevayî bidin ber çavan û dîsa hêviya min ji rojname û kovarênu ku nîvisî çap bikin ji ev e; Tu tişteki ji nîvisî nebirrin.

Bi sedan hevalênu ku me di salêne hefteyî de bi hev re kar dikir baş dizanîn ku min tu caran karen malbatî û yên siyasi tevlihev nedikir û nekirî. Min di nava tevgera welatparêzî de, wek welaperwerekî, li gora zanîn û karîna xwe, kar kiriye. Min tucarî ji ber malbata xwe şerm nekirî ye. Lî belê min ne weke nûnerekî malbatê ji di nav tevgera welatparêzî de kar kiriye.

Weke minakek berbiçav bi navê rêtixtinâ me ya siyasi lê bi giranî bi însiyatîfa min di sala 1979-80-î de, me 500 donim erd ji yên malbatê veqetand û da malbateke din ku niha ji ew erd di desten wan de ye.

Birayê min yê ji min mezintir, di sala 1970-71-ê de ji doza li ser DDKO-ye de du caran hatîye girtin. Cara duduyan tevlî birayê min i mezîn, bavê min û apê min, demekî di girtîgeha Seyranterep (Diyarbekir) de, weke girtîyêni siyasi man. Welatparêzîn wê demê tev wan nas dîkin. Birayê min yê ji min mezintir, ji doza DDKO-ye bi 12 sal zîndan û 4 salan ji welêt bidûrxiştinê hate cezakirin.

Kovara Berbi Sala 2000 ï (2000 ne Dogru) di hejmara xwe ya sal 1 hejmara 51-ê de, ji arşivîn dewletê yên veşîrtî, rêtejimareke eşîrîn di çavê dewleta tîrk (TC) de xaîn û yên hevalbendêne dewletê raporeke

dirêj weşand. Di vê weşana xwe de kovarê du rûpela xwe ya 14-an de navê eşîra KIKI û navê serokê eşîrê (Bavê min) di nav rîza eşîrîn ne hevalêne dewletê de rez kir.

Mînakêni bi vî awayî pirr in û gelek kesen li jiyanê ne pîrre caran bûne guwahen (şahîden) mînakêni weha. Helbet malbata min bi hezaran bi deh hezeran ji malbaten Kurd ku di rewşa Kurdistanê ya iroyin de bi ber peşka xerabiyê ketine, numûneyek e.

Ez dixwazim bi kurtî li ser bûyera sala 1990-î ku APO'ya anîn serê malbata min, rawest im. Ji ber ev bûyera di nav malbatê de bû destpêka gelek nebaşîyen ku iro ji dom dîkin û aliyejin di de ev bûyera li dijî "kevnehevalê" xwe bi nav dîkin. Lî di hejmara berê de bûyera li dijî "kevnehevalê" xwe bi nav dîkin. Lî di hejmara pê re sedemîn bûyera bi berîya salen 1980-î ve ku li gelek deveren Kurdistanê rû dan û hê ji di rewşa Kurdistanê de birîneke bê derman e.

Ji malbata me berî sala 1980-î yek merivek bû hevalê APO'yan, yan ji dan û stendina wî bi wan re çê bûn; Ev meriv piştî sala 1980-î yî bi navê APO'yan hate girtin û pênc salan di girtîgeha Diyarbekrê de ma. Piştî derketina wî ji zîndanê nakokîy an di nav wî

Kızıltepe'de MHP

İÇİT SILAH ZORUYUZA OY:
KIZILTEPE Gündeme Verdi: "Kızıltepe Uzunca Saçılık ve Kızıltepe'ye Yargınlık İstiyoruz" Mart yerel seçimleri nedeniyle MHP' den aday olan adamları Kızıltepe halkından nisan zoruya oy istedileri örenildi.

MHP' den Kızıltepe Belediye Başkan Adayı olan Mahmut Küçükaslan Belediye Meclis Üyesi Mahmut Gümrük, Ali Küçükaya, Zümrüt Kürkçü ve İl genel meclis üyesi Musa Kurga, Süleyman Gümrük, Hasan Gümrük ve vecîcî yetevi Ahmed Kurga, Sait Karakuş, Bayram Demirel, Ali Çelik ve İhsan Çetin İmamoğlu'nun Kızıltepe halkından nisan zoruya oyu vermemeleri istenildi. Kızıltepe belediye meclisi ise Kurga ve Küçükaslan adamları oyu vermemeleri istenildi. Hina gotin: "Dibê em rahêlin silehîn dewletê, hina gotin na."

an gelek kes piştî nakokîyên bi APO'yan re, xayîn hatîn îlankirin, hatîn kuştin. Semîr, M.Uzun, M. Şener, Resûl û hwd... Rêxistin di destê mezinê wan de kera serbînîye. Dilê wî ji kê re nexwaze, ew kes bi erzanî dibe "xayîn" û tu kes nikare li ber emrî wî rabe. Heta, ne kesen ji rêtixtina wî, bi sedan weletparêzîn herçar alîyên Kurdistanê tevlî rêtixtinê xwe li gora APO xayîn in. Ev babetkî gelekî fireh e û di bawerîya min de rêtixtin û şexsiyetîn weletparêzîn bersîva vê yekê kêm didin.

Em vegeerin mijara xwe; Di roja 30.09.1990-î de, ro li nîro APO'yan girtin ser gundî me. Ji malbatê çar kes dane ber gullan. Sisê ji wan hatîn kuştin û yê çara, di dil wan de ku ew ji mirîye, bi du gullan birîndar ma. Gava vê bûyera rûda, yê bi du gullan birîndar 17 sali bû û yên hatîn kuştin yek ji wan 16 sali, yek 30 sali û yê din 48 sali bû. Yê birîndar ku niha li Swêdê ye û destekî wî sebet maye, dibeje: "Ez û yê 16 sali ku hate kuştin me hazirîya xwe dikir ku em têkevin nava refîn serkeran û ji bo azadiya weletê xwe şer bikin. Ma me ci zanîbu ku ev roj li pêşîya me ye?" Ez bawer im rast dibêje, ji ber iro ji bi hezaran xorten nugîhiştî, xwîngerm, ji dilen xwe yên paqîj, di nav refîn serkerande cih girtine û digrin. Bi hêviya sibe dusîbe Kurdistanê rizgar bikin xwîna xwe ya paqîj direjin, lê pir dereng lê hay din ku pêşaveniya wan ci bi serê wan û welet de anî ye û tîne.

Di rojnameya Berxwedan hejmara 111 (30.09.1990) û hejmara di pê vê re (15.10.1990-î) de li ser bûyera du caran hate nîvisandin, herdu caran di nîvisandin xwe ya rojname yê durrûtiyeke nayê veşartin weşand. Hin nakokîyên di van

herdu nîvisandin û Berxwedan de ev in:

....Di hejmara 111-an de navê yên hatîne kuştin ku didin ne rast e. Navê di nîvisandin de didin, ku qaso hatîye kuştin, navê wî kesê ku di ber wan de 5 salan di zîndanê de razayî, ye û ew meriv hê ji sax e.

...Dibêjin "Me filankes (nav dînîşin) û sê parêzgeren Gund kuştine." Ev ji xwe bîntar jêra tun e. Ji ber heta bûyera û piştî bûyera bi du mehan tu kesekî ji malbatê û ji Gund ranehîstibûn çekên dewletê.

...Di nîvisâ 15.10.1990-î de dixwazin derewen hejmara berê serrast bikin. Lî bêtir bi nav derewan de diherin; Di hejmara berê de bûyera li dijî "kevnehevalê" xwe bi nav dîkin. Lî di hejmara pê re sedemîn bûyera bi berîya salen 1980-î ve girêdidin û dixwazin rî ji ser rastiyê dagerinîn. Her weha naven yên kuştu ku di hejmara 112-an de didin ne rast e. Navê ku didin, navê yê birîn-dar e.

...Di hejmara 15.10.1990-î de parêzgeriye Gund daftin alikî û dibêjin "me ajan kuştine". Me li jor nîvisandibû, yê 16 salî ku hatîye kuştin û yê 17 salî birîndar ma, di haziriya hevaltiya wan de bûn...

...Di hejmara 112-an de sergirti li ser min ji nîvisandine ku min şûna yên hatîne kuştin "tevlî ku ajantîya wan diyar e", bi navê wela-parêziye, daniye. Ev ji ne rast e; Ji ber di pê bûyera re APO'yan, piştî çavtîrsandin û gefen li malbatê xwarin, dîtin ku çar nekir, têkili bi malbatê re danîn (yê ku ji ali APO'yan de têkili bi malbatê re danîn û ji malbatê yên ku têkili pê re hatîne danîn diyar in) li ser navê wan bi malbatê re gotinî wan ev bûn:

"Partiyê informasyonên şaş stendine û ev xeletiyek e, di şo-reşan de xeletiyen weha çedîbin, em amade ne xwîna yên kuştu bi din, wan şehîd bîhesibînin û emê zarokên şehîdan xwedî bikin..." Bersîva malbatê her weha bû: "Em tu tiştekî ji WE naxwazin. Bi tenê we li ser bûyera li ku nîvisîbe, xeletiyê ji bi wî awayî binivîsinin bes e..." Piştî ji van danûstendinan encamek demeket di nav malbatê de ji nakokîyê dest pê kir. Hina gotin: "Dibê em rahêlin silehîn dewletê, hina gotin na."

Wê demê têkili bi min re danîn, ji min ji pirsîn. Bersîva min geleki vekirbû: "Malbat nikarin li dijî rêtixtinan şer bikin û ne rast e ji. Devê xwe bixin birîna xwe û her weki çar kesen we, di bûyereke trafikê de mirin, bîhesibînin. Ji derveyî vê yekê hûn ci bikin, ez wek şexsekî ne bi we re me..."

Newekhevlikirandin di nav malbatan de xwezayî ye (tebîfiye). Ji ber bû û bawerîyeke siyasi û hevgirti di nav malbatan de tune. Di bûyeren weha de kesen ji bêriyê bazidin zûtir ekere dibin. Wek agahdarîyeke biçük; Di helbijartina 27-ê Adara 1994-an di sindoqa helbijartînê ya gundû me de ji nezîki 1000 dengî 3 (sisê) deng ji partiya Turkeş re derketin e. Lî ci dibe bila bibe ez li hemberi rahiştina silehîn dewletê me. Tew piştîriya partiya Turkeş li gora min bi tu sebebân nayê izahkirin...

Gava bi tevayî mirov li rewşa Kurdistanê ya iro dinêre li gelek derveran bi afîkariya dewletê, lê bi bingehin piştî xerabiyen APO'yan, mixabîn Turkeşê ku di salen 1970-î de nikaribû piyê xwe bavêje Kurdistanê, iro li gelek deveran serokatiyan Belediyan girtiye û di Kurdistanê de bi cih dibe.

APO'yi bi gur re dikujin, bi xwedî re şûnê daftin hem xelkên bê guneh dikujin, wan dajon ser xerabiyen û hem ji wan vedikişin û bi wan dikenin.

Qezaya keştiya "Estonia"...

Wek mîsal ji Norrkopingê 56 ke-

sên teqawud ku endemê komelekê bûne, ji Borlengê 44 kesen ji sendîka metal teqawud bûne, 30 karkirêne jin ku xebatkarê belediya Lindesbergê, 19 xendevanê dibista-na Încilê, 67 memûrên sivil ku di karêne ewlekarî yê welayeta Stockholm de kar dîkin, 26 memûrên karê adiliyê de kar dîkin, 21 xebatkarê şirketeka xaniya da kar dîkin û hwd hebûne.

Keştiya Estonia di sala 1980'î de hat çekirin, dirêjayîa wê 155,4 metre, firehiya wê 24,2 metre, kapasita wê 460 otomobil, 2000 rewi bû.

Binavbûna Estonia di dema aşıtiyê de qezaya herî mezîn e ku li Ewrûpayê rûdaye. Qezayen bî rengî yên deryayê di sedala me de çebûne. Ya herî bi nav û deng ku li serî film hatîne çekirin û pirtûk hatîne nîvisandin; Titanic e.

Parlementoya Ewrûpayê...

Nuha ji hîn ew di hefsê de ne û mahkema wan bi dawî ne-hatiye. Şûna dagirtina parlamenteñ DEP'ê û hîn parlamenteñ ku mirine dê di 4'ê Çileya Pêşin de hilbijartineke navbir çebibe.

Serokê Partiya HADEP'ê Murat Bozlaq got ku ger şertîn demokartîk bi cih ney-

Titanic di Nîsana 1912'an de li Bakurê Atlantikê li çiyayekî qesayê diqelibe, 1503 kes dimrin.

Qezaya herî mezîn ya li Filîpîn heft sal berê, di Çileya Pêşin ya 1987'an de bû. Keştiya Dona Paz li zinaran diqelibe 3967 kes dimrin. Salek beriya vê bûyere du bûyere din bi vî rengî dibin. Li Derya Reş keştiya Admiral Nakhimov diqelibe 423 kes dimrin, di Gulana 1986'an de li dervayî Bangladeş keştiya Samia qelibî 600 kes mirin. Salen 90'î sê qezayen mezîn rû da. Sala 1991, Çileya Pêşin keştiya Salem Express li nézî Misrê qeza derbas kir 476 mirin. Di Sibata 1991'an de keştiya Neptune li avê dawer bû û bi sedan kes mirin. Her di eyîn salê, meha Nîsanê de keştiya Jan Heweliusz qelibî, 54 kes mi-

Heval M. Elî Parilti
di 20'ê Tebaxê de li
Nîsîbînê ji aliyê hêzîn
tarî ve hat şehîdkirin.

Em ji malbatê wî re
sersaxiyê
dixwazin.
Dê biranîna
wî di têkoşîna
gelê me de bijî.

Alîgirê
YEKBUNÊ
li Swêdê

M. Elî Parilti



1966 -20.08.1994

10 saliya salvegera mirina Yilmaz Guney

Di 10 saliya
mirina Kurdperwerê
mezîn
Yilmaz Guney de,
em wî
bi
hezkirineke kûr
û
bi hurmeteke
mezîn
bi bîr tînin.

Armanc



Yilmaz Guney (1937-1984)

Mînakêni weha di bakurê Kurdistanê nîvalabûyî de gelek in. Yek ji wan eşîra Jîrkiya ye. Ev eşîr ji destpêka serîhîdanê Kurdistanê heta sala 1984-an beşîrî hemû serîhîdanê Kurdish bûne. Piştî sala 1980-î welatparêzîn bakurê Kurdistanê yên hemû hêzan di nav Jîrkiyan de sitirîn nanêwan xwar-

in û bi xwedî bûn. Eger em bi serîyekî sar û bi dilekî germ li sedem û encamî hemû bûyera hûr binêrin, emî basizanibin ku piştî kijan bûyera yên weke Jîrkiyan bûne alîgirîn dewletê...

Di dîroka tu gelan de rûreşî heta dawîyê veşîrtî nemaye... □

Kultur û Politika

Riza Polat

Hespê "Troya" yê; Mumtaz Soysal

Xususiyeteke siyaseta Dewleta Tirk ya qilêr û fêlbaz careke din di van rojêñ dawî ñe bi guhertina wezîrî derveyî dest pê kir. Di dîroka Tirkan de helwêstên weha ne nû ne. Di her demeke ku xwestibin daxwaz û parsekiya xwe bi xeyrî xwe bidin qebûlkinê, dest bi fêlbaziyê kirine.

Di dema ñerê sar de Tirkan ji bona bertîl û heqê xulamtiya xwe her tim şantaj bi Rojava û Amerikayê re kiribûn. Tirkan piştî Şerê Cihanê yê Duwemîn ji bona alîkariya malî û eskerî ji Amerika û Rojavayê bistînîn, iiddîa kiran ku Sovyetê doza Tengava Îstenbolê kirîye, heta iiddiayen dîrok-nîvîsa ew e ku ev fêlbaziya Tirkîyê bû sebebê destpêka ñerê sar ya di navbera Rojava û Rohîlat de. Ji alîkî din jî ïsmetê Ker (Inöni) ji bo ku Rojavayê tehdît bike, lîngîkî wî jî li Moskovayê kêm ne dê bû. Iro jî ji bona ku helwesten xwe bi cîran û xeyrî xwe bidin qebûlkinê, dest bi şantaja kirine.

Masmedia Tirkan dest pê kîrine ku dibêjin, hema hema li Kurdistana Başûr welateki serbixwe ava dibû lê diplomasîya Tirkan rê li ber wê girtiye. Li gor iiddiayen wan li Fransayê destüreke esasî ji bo Kurdistaneke serbixwe dihat amadekirin. Ji bo vê jî Mesûd Barzanî û Celal Talabanî hatibûn dawetkirin daku li Fransayê vê destûrî ìmze bikin.

Dewlet û çapemeniya Tirk jî baş dizanîn ku ne îlankirin û ne jî amadekirina destüreke esasî ji bo Kurdistaneke serbixwe li ortê heye. Lî ew ji bo ku siyaset û fêlbaziya xwe bi cîh bikin, dereweke welê ji xwe re kîrin hêcet daku raya giştî pê bixapînîn. Yan ne, ew jî baş dizanîn ku Fransa ji wek piranîya dostîn Kurdan, bi wî ñerê birakujîyê pir aciz bû, ji bona ku dawîya vî ñerê bîne, Barzanî û Talabanî dawetî Fransayê kirin. Ew belgeya ku Tirk dibêjin destûra esasî ye, di eslî xwe de peymana rawestandina ñerê di navbera PDK û YNK'ê de ye. Lî Tirkan ev hedîse wilo mezin kîrin ku ambargoeyeke ñu danin li ser Kurdistanê, vize û çûnûhatina Kurdistanê bi tevayî xistin bin kontrola Seddam.

Armanca guhertina Wezîr Derve di eslî xwe de ne ji krîza hukumetê û ne jî ji ïknakirina terefîn çep tê. Dewleta Tirk birek peymanîn navnetewî yê derheqê heq û huqûq û azadîya mirovayetiye ìmze kirine, lî sal di ser re derbas dibin, hê tu gav ji bo bi cikirina wan nehatine avêtin. Bi fêlbaziyê xwe her rojê hêcetekere nuh derdixin pêşîya Rojava û Amerikayê. Duhî bi hebûna Sovyetê û girêdana pîrsa Kurdi bi kommunîzm re, destek û alîkari ji Amerika û Rojavayê distendin, iro jî bi destê dewletê hînek provakasyonîn dînî pêktînîn û muttefîkîn xwe bi tevgera îslamî ditîrsînîn.

Dewleta Tirk piştî faydenekirina parsekiyê dest bi şerrûdiyê kir. Di dema Şerê Xelîcê de Tur-gut Ozal digot "emê yekê deynin sîya bigrin". Lî dem û sal buhu-rîn, hesabîn Ozal li hev derneke-

tin. Di demê ñer û piştî Şerê Xelîcê de, derî bi derî geriyan, par-seki kirin. Ji şex û melîkîn Ere-ban bigrin hetta bi Japonayê des-tê xwe li ber xelkê vekirin, heqê xulamti û berfla xwe xwestin. Ü bi ser de jî her roj Awrûpî û Amerikayê ambargo û rexne bi ser Tirkîyê de dîbarandin. Hukûmetîn Awrûpa û Amerikayê her roj ne-razîbûna xwe li ser pîrsa gelê Kurd û heq û azadîya mirovayetiye diyar dikirin. Hat wê dereceyê ku Amerikayê Tirkîye bi qutkirina alîkariya eskerî ya ku bi "%10" tê nav kîrin tehdît kir. Di rapora Komîta Mafê Mirovayeti ya Wezîr Derve yê Amerikayê de ev e çend salêñ dawîne her tim Tirkîye tê gunehkarkirin. Almanya her roj bala Tirkîyê dikşîne ser wan sîlehan ku li dijî gelê Kurd têñ bi karanîn.

Herkes dizanî ku rastîya Tirkîyê ew bû ku hespekî "Troya" yê ji bo wê lazim bû, ji bo ku raya giştî pê bixapînîn, Mumtaz Soysalî genî û qirêjî ji bo Hespê "Troya" yê herî bas bû.

Zîlm, zordarî û qetşiamen dewleta Tirk ku li Kurdan dike, her roj di rojeva Parlamentoya Yekîtiya Awrûpayê de ye. Her roj dos-yayekê ñu ya li ser rûreşıya wan tê vekirin, bi taybetî piştî girtina DEPê û hepsikirina parlamenteñen Kurd, Tirkîye ket tengasîyeke din.

Ji bona ku bi fetreyekê kin be ji cardin xelkê pê bixapînîn û ji wê tengasiyê hînek sist bikin ji xwe re rîyênuh peyda dikin. Herkes dizanî ku rastîya Tirkîyê ew bû ku hespekî "Troya" yê ji bo wê lazim bû, ji bo ku raya giştî pê bixapînîn, Mumtaz Soysalî genî û qirêjî ji bo Hespê "Troya" yê herî bas bû.

Çapemeniya Tirkîyê rûyê Mumtaz Soysal yê ku piştigirîya cûnta Kenan Ewren dikir bin cil kîrin û dijayedîya wî ya li hember tevgera rewşenbîrîn Tirkan ya di salêñ cûntayê de jî veşartin, û xwestin drûveki sosyal demokrat û çep bidinê û bi vî awayî wî derxin pêş. Xwestin bide xuyakirinê ku yekî "azadîxwaz", "demokrat" û "dîjî" emperyalîtyê bû Wezîr Derve. Ji bona ku siyaseten xwe yê gemarî bimeşinîn Mumtaz Soysal wek "Teyrê Baz" dan naskirinê.

M. Soysal bi yekser xwe çû civîna Yekîtiya Miletan û li wir qetliam û zîlma li Kurdistana Bakur û qedexekirina çûnûhatina ji bo Kurdistana Başûr bi wî ruyê xwe yê genî parast û abûqatiya Seddam Huseyîn kir. Tirkîye ji aliye kî dixwaze bi Surfiye û Iranê re dan û standina xwe pêşve bibe û ji aliye din ve ji ber digere ku Saddam di herêmê de xurt bike. Ev hemû tişt û guherandina wezîrî derwe ji bona ku ew zexta Awrûpî li Tirkîyê dikin hînek sist bikin û hînek din parseki û bertî ji Rojavayê û Amerikayê bistînîn şantaj in.

BEROS

Mahmûd Lewendî

Camêr jî ji gundekî wek gundê pîrika min hatiye

Pîrika min a Etê di jiyana xwe de bajar nedîbû, içar wexta ku me digot emê herin Swêregê, pîrika min a Etê di got:

-Ma Swêreg mezin e?

-Erê pîrê pir mezin e!

-Ma jî gundê me jî mezintir e?

-Erê, wîî!

-Ma bi du qasî gundê me hey'e!

-Hê mezintir e, hê mezintir!

Pîrika min di jiyana xwe de tenê gundê xwe û çend gundê din ên Qerejdaxê dîtbû. İcar muqayesekirina wê dê çawa be. Nufusa Swêregê 80 hezar e û nufusa gundê me jî 800 e. Ü pîrika min jî dikare tenê te-sewwur bike ku Swêreg ducara ji gundê me mezintir e.

Camêrek ji gundekî wek gundê pîrika min, ji mecbûri hatiye Swêdê. Ü piştî demekê camêrê me diçê qursa zimanê Swêdî. Wek her zimanî, di destpêkê de Swêdî jî pir rehet e. Mirov gotinê besit fêr dibe.

Yanê destpêk zimanê zaro-ka ye. Camêrê me jî bi wê Swêdiya xwe ya zarokekî çar salî, dibêje:

-Swêdî jî ne tu ziman e lo!

Zimanekî feqîr e. Li ber zimanê Kurdi ne tu ziman e.

Ji xwe kultura wan jî eynî wek zimanê wan qels e. Ci kultur e ci hal e, tenê petate û masî ye.

Ê de bifikkirin, milletek ku ev serê hezar salan e dewlet e, hem jî dewleteke bi rîk û pêk. Bi hezaran hu-nermend, zana û nivîskar û hwd ji nav vî milletî derke-tine û camêrê me yê jî gundekî wek gundê pîrika min hatiye, radibe dibêje "ev ne ziman e û ev ne kultur e".

Ü hîn gelek tiştên din. Ü ev camêr ku ji gundekî wek gundê pîrika min hatiye, di nav rîexistineke kurdan de dikare bibe serok jî! Ü emê jî, an jî hînek ji me wê li dû wî biçin. Ü ewê li ser me bîryarê bide! Ü mumkun e ku me hemûyan an ji me hîne-kan qir bike! Ez bi xwe naakevim nav partiya vî camêrî. Lê yên ku ji ruhê xwe aciz in bila têkevinê.

Tirs

Gunehkarî bêgunehîya herî mezin e. Ger tu zanî û kanî binivise. Ger tu nizanî û nikanî dîsa binivise. Di herdu halan de jî tu gunehkarî. Yanê sûcîdar. Sûcîdar jî ceza dikin. Cezakirin jî li gor cezaker diguhere. Ji çermguranê bigre heta bi poz-jekirinê. Edî tu û şans û serokê xwe-pardon-yanê cezakerê xwe!

Lê ger tu pesnê cezakerê xwe bidî, xelas! Di mertebe xwe de tu dikarî pir bilind bîbî. Heta, tu yê welî bilind bîbî ku êdî ev dunya wê li ber çavê te piçûûûûûk bibe û wenda bibe. Ji xwe dunya ji ber çavê te wenda bibe, divê tu ji xwe re li dun-yayeke din bigerî!

Însan derewîn in!

Dunya ci xerîb e. Belki jî ne dunya, lî însan ci xerîb in. Însan mehlûqatêñ herî bi aqil û herî bê insaf in. Heywan jî mehlûqatêñ dixwazin, tiştekîr jî hebe içar hemû tiştan dixwazin. Hemû tişt jî hebin, içar hevûdu dik-

hebe bes e, qîma xwe pê tînin. Ji bo însanan xwarin hebe, tiştekî din dixwazin. Tiştekî din hebe, içar tiştekîr jî hebe içar hemû tiştan dixwazin. Hemû tişt jî hebin, içar hevûdu dik-

ujin. Ger kesek tunebe bîku-jin, içar xwe dikujin.

Lê bi ya min, dîsa jî fer-qa herî mezin a di navbera însan û heywanan de ew e ku; insan derewan dîkin, lê heywan nakin!

Ew kî ye li ser têlê?

Ax axxx! Ci dunya ye! Kultura me ya telefonê jî hatiye guhertin. Berê wexta ku me telefonî hev dikir, me digot "ew kî ye li ser têlê?" Ü paşê me digot: "Hela ban filankes kin, bila ew jî were ser têlê!" an jî "ma çîma Seydo nayê ser têlê?" û hwd. Lê nuha dibêjin "Elo tu kî yî?" an jî tenê "Elo!"

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar:Hesen Mizgîn

Li Brezilyayê marmarok (marjok) û şikleke kaktusê bi hev re hevkariyeke pir balkêş dikin. Dendikê fêkiyê kaiktusê heta ji zikê marmarokê derbas nebe, zil nadî. Navê vê marmarokê bi Latînî; propidurus torquatus û yê kaktusê jî melocatus violaceus e.

Jibo hilberîna litreyek rûnê gul divê mirov 1 300 000 gul bicivîne. Yasernîna ku sultana kulîlkan e; ji bo litreyek rûnê ya-semînê 5 000 000 yasemîn divê.

Li hemû banqeyê li dunyayê, nêzî 120 000 ton zêr heye, nîvê van zêran li banqeyen merkezi wek resvera dovîzê tê spartinê û nîvê din li ba zêrfiroş û malan e.

Li gor psikolog-doktor Alexander H. Glas-sman (li Universîteya Colombya li Amerikayê) nîkofîn depresyona nexwesîn psîkolojik kêm dikin. Dema mirov dikeve talûkeyekê laşê mirovî hormonê stressê serbest dihêle, damarên qalind ên xwînê yan fireh an jî teng dibin, frekansa dil an zêde an jî kêm dibe. Ev reaksîyonâ ha ûmkanâ têkoşîna ji bo jînê yan jî bo revê diafirîne.

Li gor lêkolîna Prof. William H. Karasovê amerikî hin teyr dikarin ji kapasîta xwe du qat zêdetir xwarin bixwin. Ev teyr bi du şiklî dikarin zêde xwarin bixwin, an xwarin ji normalê du qat lezter ji hezmkirinê derbas dikin an jî dikarin roviyê xwe ji % 20 dirêjtir bikin.

Grûbeke lêkolinerên Awustralî li Tasmanyayê darekî ji şiklê çamê ku 38000 salî ye dîtine. Li gor lêkolineran li Tasmanyayê ji van darêñ çam ên di navbera 7000-13000 salî de gelek in.